german
cooperation
DEUTSCHE ZUSAMMENARBEIT

# Rênimûna saxlemiya piştgiriya derûnî-civakî (MHPSS) li geşatiyê

## Wek mînak li qeyrana Sûriye û Iraqê



BAfF Bundesweite Arbeitsgemeinschaft der psychosozialen Zentren für Flüchtlinge und Folteropfer

CHARITÉ UNIVERSITÄTSMEDIZIN BERLIN

giz Deutsche Gesellschaft für Internationale Zusammenarbeit (GIZ) GmbH

HAUKARI e.V.

Jiyan Foundation for Human Rights

medica mondiale

medico international

MISEREOR IHR HILFSWERK

SFU Sigmund Freud Privatuniversität Berlin

ZENTRUM ÜBERLEBEN Wege in eine menschenwürdige Zukunft

# Rênimûna saxlemiya piştgiriya derûnî-civakî (MHPSS) li geşatiyê

## Wek mînak li qeyrana Sûriye û Iraqê




# Amadekirin rênimûnê

Ev pirtûk sala 2015an ji aliyê Wezareta Fêdêral a Hevkariyên Aborî û Geşatiyê (BMZ) va hatiye daxwazkirin û ji aliyê Civata Hevkariya navneteweyî ya Almanyayê (GIZ) (Bi berpirsiyariya sînordar) va bi hevkariya çalakên civata şaristanî ya Almanyayê her wiha derûnnasên azad hatiye plandarêştin ku li warê saxlemiya derûnî û piştgiriya derûnsî-civakî ya qeyrana Sûriye û Iraqê (MHPSS – Mental Health and Psychosocial Support) digel penaberan û kesên awarevbûyî li navçeya Rojhilata Navînê û Almanyayê hevkariyê dike. Ev pêspartî li gorî daxwaza BMZê ji bo amadekirina rênimûna li barê taybetmendiyên karê baş ji bo xurtkirina MHPSSê li warê qeyrana Sûriye û Iraqê pêk hat. Her wiha li nav şirîkên projeya navçeyî ya GIZê ``Piştgiriya derûnansîya civakî derbarê penaberên sûrî/iraqî û kesên aware yên navxweyî`` hewcetî bi danûstandina bihêztir li ser van taybetmendiyan û nêrîneka hevpar hebû.

Ev pirtûk ji billî kovarên pisporî li ser esasa agahiyên bidestxistî ji aliyê komxebata navenda derûnî civakî di asta fêdêral da ji bo penaber û goriyên işkenceyê, Binyata Xêrxwaziyê ya zankoya Pizişkî ya Bêrlînê, Haukari (Hawkarî), Binyata mafê mirov a Jiyan, medica mondiale, medico international, Misereor , zanîngeha Zîgmond Froyd

(Sigmund-Freud) a Bêrlînê û navenda Mayînê hatiye amadekirin. Di navebra Tîrmeha 2017an û Adara 2018an da, fîdbek ji 66 rêxistin û enstîtûyên dewletî û sivîl ku li Sûriye, Libnan, Tirkiye, Iraq û Urdinê dixebitin, derbarê sererastkirina yekem a vê pirtûkê hat wergirtin. Bi amadebûna zêde ji 120 kesan di vê heyama kargeh û hevpeyivînan derbarê bingehên piştgiriya derûnsî-civakî ya baş li warê qeyrana Sûriye û Iraqê hat lidarxistin. Encamên berhevkirî li vê pirtûkê bi hev ra hatin cihgirtin.

Lewma ev rênimûn pitûkeka hilêxistina helwêsta hevpar a li gorî rewşê ji bo hevkariya geşepêdana aborî ya Almanyayê ye ku nêrîna rêxistin û karzanên beşdar li warê karê derûnsî-civakî ya baş têkildarî penaberan û eva ku çi metirsî û xeter divê bên berçavgirtin, nîşan dide. Muxatebên wê çalakên beşa MHPSS e ku li warê penaberên li Rojhilata Navînê û kesên ku têkildarî qeyrana Sûriye û Iraqê dixebitin, her wiha wezaretxane û enstîtûyên zanistî ne. Ev pirtûk divê wek belgeyeka bingehîn were zanîn ku ji bo plandarêştin, cihanîn, bernamedarêştin û nirxandina çalakiyan her wiha jibo rêxistinên alîkarîgihan li nirxandina bingehîn a kiryar û daxwazên pêşniyarkirî taybetî piştgiriya derûnsî-civakî ji penaber û civatên mazûvan, rêbazan nîşan dide. Bona vê mebestê ev pirtûk pêkhatî ji hin xalên kalîte û çawaniyê ye ku çaverêtî heye li warê geşkirina kiryarên bona tesbîta derûnansî û dermankirina kesên tûşbûyî bi tecrubeyên revîn û şidetê û hevkariyên geşatiyê yên hestiyar li hemberî ziyana rûhî û derûnî (EZ) alîkariyê bike.

Ev pirtûk **„belgeyek zindî“**, ye ku berovajiya strandardên ku metirsiya sînordarkirina afirînerî û xuliqkarî li wan heye û hokarên taybet ên çandî, erdnigarî, civakî û siyasî berçav nagirin, hertim hewcetî bi hevsengbûna bi zemîneyê heye.

Li gorî guhertinên berdewam li rewşa siyasî û civakî, ji billî hevsengiya dûrbûna bi hiuncet ji xalên sereke jî pêkan e. Ev belge bêyî berçavgirtina armanca tevgeran, ji bo têkilliya digel şirîkên herêmî jî alîkar e. Tevî amadekirina vê belgeyê ji gotin û nêrîna almanî, dikare ji riya çalakên din ên navneteweyî jî wek bingehek ji bo helwêsta wan a taybet were bikaranîn.

*Xebata hestyar li hemberî ziyana rûhî-derşnî an birêxistinkirina çalakiyan bi awayekî ku li hemberî ziyana rûhî-derşnî hestiyar be, bi vê wateyê ye ku ji her cûre taybetmendiya li cihanîna çalakiyên ku renge bi wateya tecrubeya ziyanê be û bibe sebeba ziyanê, dûrî bike: Hesta gef û filitînê, tecrubeya tirs û bêşiyaniya zêde, jidestdana xwebawerî û kontrolê. Lewma hûrbûna li ser rewşa giştî ye ku herî pirr pileya ewlehiya pêkan, şiyana pêşbînîkirinê û pêbaweriyê pêkan bike, da ku kontrol û xwebaweriyê di her qonaxekê da bide kesên li ber ziyan û zirarê. Hemî kesên ku digel penaberan dixebitin divê derbarê mînakên bingehîn ên dînamîka ziyan û xisarê rûhî-derûnî agah bin (Wek mînak gelo hokarên handêr hene ku dikarin nakokiyên piştî ziyan û zirarê rûhî-derûnî ji nû va pêk bînin) û divê li gorî koma şolî û zemîneya ziyanê rewşa giştî were sazkirin.*

# Lîsteyaya Kurtenavan

| | |
|---|---|
| **BMZ** | Wezareta fêdêral a hevkariya aborî û geşatiyê |
| **cfw** | Plana destmizdê pêka xebatê |
| **EZ** | Hevkariya ji bo geşatiyê |
| **GIZ** | Civata hevkariya navneteweyî ya Almanyayê |
| **IASC** | Komîteya hertimî ya nava Ajansê |
| **ICD** | Pileberndiya navneteweyî ya tomarkirina nexweşiyê |
| **IDP** | Internally Displaced Persons – Awareyên navxweyî |
| **IFRC** | Fêdêrasiyona navneteweyî ya Xaça Sor û Civata Heyva Sor |
| **IS** | Koma qaşo Dewleta Îslamî |
| **LGBTI** | Jinên hevzayendhez, Mêrên hevzayendhez, Duzayendhez, kesên trans û duzayendî |
| **MEAL** | Çavdêrî, nirxandin, berpirsiyarî û hînbûn |
| **MHPSS** | Siheta derûnî û piştgiriya derûnî-civakî |
| **PFA** | Psychological First Aid – Alîkariyên seretayî yên derûnnasiyê |
| **PSS** | Psychosocial Support – Piştgiriya derûnî-civakî |
| **PTBS** | Aloziya strês û bêhedariya piştî ziyana rûhî-derûnî – Inglîsî: PTSD |
| **UNHCR** | United Nations High Commissioner for Refugees – Komîsaryaya Bilind a penaberan a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî |
| **WHO** | World Health Organization – Rêxistina Tendurustiya Cîhanî |

# Lîste

1. Bandorên derûnî-civakî ya tundî û revînê çî ye? ... 9

2. Kêşeyên taybet ji hewcetiyên derûnî-civakî ya goriyên şideta însanî çî ye? ... 11

3. Hewcetiyên derûnî-civakî ya taybetî penaber û kesên aware li warê qeyrana Sûriye û Iraqê çî ye? ... 12

4. Wateya MHPSS li warê pevçûn û awaretiyê çî ye? ... 15

5. Çi têgihîştinek ji ziyan û zirarên derûnî-civakî divê bingeha hevkariya ji bo geşatiyê ya Almanyayê be? ... 19

6. Me derbarê nêrînên MHPSSê li warê şer û mirovan çi tişt hêvosîne, û çawa piştgiriya derûnî-civakî ji penaber û kesên aware yên navxweyî dikare li warê qeyrana Sûriye û Iraqê were plandarêştin? ... 24

7. Tecrubeya Hevkariya geşatiya Almanyayê di pratîkê da çawa tê xûyanê? ... 28

8. Çawa dikare rihetî û siheta derûnî û civakî ya kedkarên MHPSSê tê misogerkirin? ... 35


9. Xalên bi kalîte û çawaniyê yên jorê ji bo kiryarên siyaseta geşatiyê bona xurtkirina sihet û saxlemiya derûnî û piştgiriya derûnî-civakî çî ye? ... 37

10. Nêrînên derûnî-civakî ji bo hevkariya geşatiya Almanyayê çi nirxeke zêdebûyî (Value Added) raber dikin? ... 44

Şiroveya dawiyê ... 46

Lîsteya çavkaniyan ... 48
    Pêşniyazên ji bo çavkaniyên kemilandî (Inglîsî) ... 52

Pêvek – Temamkera beşa 10 ... 54



# 1. Bandorên derûnî-civakî ya tundî û revînê çî ye?

Pevçûnên çekdarî ne tenê bandorên wêranker li ser binavahî, ewlehî û geşatiya abora welatekî datînin, belkî her wiha bandorê li siheta rûhî û civakî ya mirovên ziyandîtî jî dikin. Nebûna naskirinê û dermankirina renc û êşên rûhî di asta kesane û komkî da, hevgirtina civakî ya civatê, sûdeweriya aborî û tenahiya wê dxie ber zirarê *(1)*. Têkilliya navbera pevçûnên tund û strêsa derûnî lihevalyayî ye û pirrî caran nikare were pêşbînîkirin *(2)*.

Revîn li warê pevçûnên çekdarî û şidetê ji billî dûhatên madî, dibe sebeba tecrubeyên ciddî yên jidestdanê ji wan jidestdana endamên malbatê û hevalan, hesta girêdayîbûnê, kontrol û serxwebûn û berdestbûna çavkaniyan. Ji billî viya, penaber zêdebûna ziyanên giran û metirsiya tûşbûna bi tundiya ber bi zêdebûnê li warê malbatî û civakî û belengaziyê, nebûna aso û dîmenek ji bo pêşeroja baş û nebûna pêbawerî û dilniyayiyê derbarê vê yekê ku pêşerojê da çi heye, derbas dikin.

Kesên ku direvin, ne tenê tecrubeyên ziyan û xisarê li navçeya qeyranlêketî dibînin, belkî her wiha li riyên revînê û piştî revînê bo kampên penaberan li welatên mazûvan dibin goriyê cihêkarî û sirgûnê. Çûyîna bo welatên mazûvan pirrî caran tûşbûna bi kêşeyên nû ye, weke pirsgirêka digel rayedaran, pêbaweriya li warê rewşa mayînê, nebûna pisportiya ziman û pevçna digel kesên xwecihî. Zexta çaverêtiyan ji welatê sereke dikare çavkaniya kêşeya zêde be. Tecrubeya işkenceyê û babetên din ên binpêkirina mafên mirov, jinavbirina aso û sêwirandina cîhanê û xwe, tecrubeya qewirandinê an dijminatiya bi biyaniyan, hesta gefeka berdewam zêde dike û rikeberiya li warê gerrîna li şolê, pêwendiyên civakî dixe ber bandor û zirarê *(3)*. Hesta bêkokbûn û bêşûnûwarbûnê dibe sebeb ku pêvajoya tevlîbûn û entegrasiyonê dijwar bibe û jiyan demkî xûya bike. Pirrî caran vegeriyana çaverêbûyî bo welatê jinûve avakirî ne pêkan e û heta dema ku ev kar pêk werem pirrî caran ji ber guhertinên berfireh li wê derê mîna xerabûna binavahiyan, jidestdana endamên malbatê û pêkhatina rêzik û çarçovên nû, rewş lihevalyayîtir dibe û destpêka nû bi metirsî ye *(4)*.

Bi kurt û kurmancî tecrubeyên penaberan dikare wek bêparbûna gellek zêde were wesifandin, ku pirranî hevrê digel hesta şermê û hesta gunehê ye. Her wiha digel hesta nefret û tolhildanê. Ji billî rewşa jiyana dijwar, kesên ziyandîtî pirranî ji xem û keser, nîgeranî, tirs, şik û guman, bêhêvîtî, tenêtî, hesta xerîbiyê, biyanîbûn, belengazî, bêşiyanî û şidetê rencê dikişînin ku reftar û liv û tevgerên wan pêk tînin *(5) (6)*. Bandorên revînê li mirov nayê rawestandin belkî li ser pêwendiyên nêzik û dûr ên kesên ziyandîtî jî bandorê dike.

Bi awayekî ku wek mînak, reftara xwedûrkirinê, tecrîda civakî û bêhestbûn, li koma jêderk a mirov jî bandorê dike. Parastina xwebawerî û hesta nêzikbûnê jibo jin û mêran dikare dijwar be û dêbav pirrîcaran nikarin pêwendiyeka derûnî ya ewleh û mayînde ji bo zarokên xwe dabîn bikin. Xem û kesera ku li hundirê mirovan e û qala wê nakin, dikare navbera endamên malbatê rewşeka hevrê digel veşartîbûn û bêdengiyê pêk bîne. Bi vî rengî, tecrubeya tundî û revînê li tevn û pêkhateya civakî ya mezintir li nav civakê xûya dibe. Tirs, nebûna pêbaweriyê û tecrîda civakî ya mirovan,

hevgirtinê ji nav dibe û dikare bibe sebeba şideta civakî, bi vê wateyê ku êdî civak û kom nikare xebat û karkerdên xwe yên girîng û bingehîn pêk bîne. Helbet dûhatên wê di asta kesane û komî jî hene ku pirranî xelekeka bêkêr û batil pêk tînin ku mirov û koman herî pirr nearam û şepirze dikin. Lewma kiryarên ji bo xurtkirina sihet û saxlemiya derûnî û civakî divê di tevahiya van astan da bi awayê hevdem dest pê bibe.

Jin aliyê din va, pirrî caran hevdemî û têkilliya dualî ya pisportiyên berdewamî û hêza berxwedanê ji aliyekî va û nakokiyên derûnî, derûnê leşî û /an bedenî û nîşaneyên nexweşiyê (weke xwedaketin, aloziyên tirsê û aloziya strêsa piştî ziyanê, rûhî – derûnî (PTBS)[1]) ji aliyê din va tên dîtin. Rêxistina Tendurustiya Cîhanî (WHO) texmîn dike ku hejmara nexweşiyên giran ên derûnî renge di rewşa pevçûnan da duberanber bibe. Heta teşeya navgîn û aram a nexweşiya derûnî li gelheyê ji sedî 10ê heta sedî 15ê ta sedî 20ê zêde dibe. Berbelavbûna strês û bêhedariya derûnî li hemî warên karkerdên civakî û şiyana karkerdê tê xûyanê.

Tevî viya, ji billî bandorên nerênî ku li jorê hatin şirovekirin, ev girîng e ku em bizanin bersiva bo tecrubeyên biêş û sekinîna li hemberî renc û derdan di rewşa niha ya jiyanê da, li her babetekê ciyawaz digel ya din e û gellek ji koçberan pisportî û şiyanên xwe yên kesane ji bo mayîna li vê rewşa dijwar berfireh û xurt dikin. Bi mebesta dengvedan û nîşandana baştir a çavkanî û xalên xurtbûnê yên kesên ziyandîtî, gotin û nêrîna civata pisporên a navneteweyî di salên dawî da bi awayekî ber bi zêdebûnê ji têgeha PTBS`ê dûr bûye û ber bi nêrîneka li gorî çavkaniyan va çûye ku berteka mirovan li hemberî zext û strêsê li girêdaneka navbera karkerdê (kêrhatî) û bersiva nekêrhatî (ne hevseng) li hemberî kêşe û pirsgirêkên cûrbicûr û hokarên ku strês û bêhedariyê pêk tînin, berçav digire.

Modêla ADAPT- (ADAPT Entegrasiyon û geşatiya piştî azirandin û ziyana rûhî-derşnî)) nîşana potansiyêl û hêza nihênî ya sazbûn û tevlîbûna serketî ya kesên ziyandîtî li warê ewlehî, pêwendî, pênase û girîngiya bûnayetiyê berbiçav dike *(7)*.

---

1 Wesifandin li gorî pilebendiya navneteweyî ya tomarkirina nexweşiyê (ICD): Taybetmendiyên nasyar ji wan tecrubeya tekrarî ji ziyanên rûhî-derûnî li wan bîranînane ku bi bêyî hemda xwe tûşî mirov tên (dengvedana bîreweriyan, bîranîna dîmenên pêştir), xeyal an kabûsan e ku li warê bêhestbûn û lawaziya hestbarî diqewime. Her wiha sersariya derheqê kesên din, sersariya derheqê derdorê, nebûna xweşî û şadiyê û xwedûrkirina ji çalakiyan û rewşa ku renge bîreweriyên ziyan û zirarên derûnî-rûhî zindî bike, *(20)* tên xûyanê. Li vî warî da divê were berçavgirtin ku heke ev nîşane di heyameka dirêj da bên domandinê, tenê nexweşiyekê nîşan didin.

# 2. Kêşe û pirsgirêkên taybet li warê hewcetiyên derûnî-civakî ya goriyên şidetên mirovî çî ye?

Tundî û şidet ku mirov bi xwe wê yekê pêk tînin, bi giştî ji aliyê kesên ziyandîtî va wek tecrubeyeka mezin a ne-edlane tê zanîn. Pirrî caran hewcetî bi piştrastkirina vê tecrubeyê wek bê edaletî û daxwaza ji bo hevderdî û hevfikrîna gellek bihêztir tê hestkirin. Têderxistina nexweşiyên weke xwedaketin û kemijînê an PTSDê renge wek girêdana ziyannasî ûbêhurmetî be ku li hemberî hewcetiya bi piştrastkirinê ye. Destwerdanên ku armanca wan tenê li ser elamet û nîşanên êş û nexweşiyê ne, dikarin careka din tecrubeyên lawaziya sînordar pêk bînin. Ji aliyê din va modêlên nexweşiyê jî renge xwedana vê potansiyêl û hêza nihênî bin ku kesê/a ziyandîtî aram bikin, ji ber ku nîşan didin ku hebûna bertekên taybet li ser esasa şidet û tundiyê tişteke xwezayî ye.[1] Ji bo kontrolkiirna van gêreyan bi rêbaza hestiyar li hemberî ziyan û zirarên derûnî-rûhî, ev girîng e ku dest ji kontrol û biryardana li bara pêvajoyên destwerdan û şirovekirinê li kesên ziyandîtî bê kişandin, rêz li serxwebûn û hêza wan a nihênî bê girtin da ku riya filitîn û rizgariyê kişv bikin û bi vî rengî digel tecrubeyên xwe bên rê û ji pêkanîna asoyên nû piştgiriyê bikin. Tevî vê yekê, li vî warî da jî pêwîst e ev yek were berçavgirtinê ku ji billî hewcetiya bi serxwebûnê li kesê/a ziyandîtî, pirrî caran hewcetî bi ewlehiyê heye ku rê li ber çalakî û dahêneriyê digire û dibe sebeba berçavgirtina destûrkarên ron û diyar li asta pîvan û nirxên civakî û çandî ya nenas. *(8)*.

Yeka din ji kêşe û gêreyên girîng û sereke li warê rûbirûbûna bi şidetên ku ji aliyê mirovan va pêk tên, mijara pêbawerî û nebûna pêbaweriyê ye, bi tayebt di rewşa şer û pevçûnên dehsaliyên bihurî da ku bi awayekî gellek lihevalyayî û bilez tên guhertin. Pirrî wextan cûreyên hêla sor û pêwendiyên goriyan û sûcdaran pêk tên ku pêkanîna pêbaweriyê gellek dijwar dike, heta di dema ku gefên derveyî ji holê rabûne. Pirrî wextan pevçûnên siyasî li tecrubeyên mirovan ji tundî û şidetê tê xûyanê û hêzên guhertina navçeyî li karên derûnî-civakî di asta biçûk da tê nîşandayînê. Naskirina deqîq û eseh a komên hedef û cûreyên nakokiyên neteweyî, navçeyî, siyasî, mezhebî, qewmî û zayendî pêwîst e da ku ji pêkhateyên ne hevseng û dijhev a pêwendiyên ku dibe sebeba nebûna pêbaweriyê li xebata derûnî-civakî, dûrî were kirin. Pêkanîna atmosfêreka pêşbînîbar, pêbawer û bi rêzdarî ji riya kesên ku tûşî tecrubeya derd û êşê bûne wek alîkar tê zanîn da ku li hemberî hesta cidabûna ji kok û rîşeyê ser bikevin û pêkanîna nêrîneka nû derbarê pêşerojê bibandor e.

Bi hûrbûna li ser şiyan û xalên xurtbûna mirovekî, pêvajoya tûşbûn û rûbirûbûna bi rewşa niha ya jiyanê dikare were xurtkirin.

# 3. Hewcetiyên derûnî-civakî taybetî penaber û kesên aware li warê qeyrana Sûriye û Iraqê çî ne?

Şerê navxweyî yê wêranker û demdirêj li Sûriyê û şer û pevçûnên li Iraqê yek ji pêlên herî mezin ên revîn û awaretiyê di serdema me da pêk aniye. Ji sala 2011an va derdora 12 miliyon kes ji xelkê Sûriyê *(9)* û 4.3 miliyon kes ji welatiyên iraqî *(10)* ji mal û warê xwe derbider û aware bûne. Derdora 5.6 miliyon kes ji gelê Sûriyê ji welatê xwe çûne welatên cînar ku di nava wan da 1.9 miliyon zarok hene. Zêde ji 6.1 miliyon sûrî û derdora sê miliyon iraqî vê demê li nav welatê xwe aware ne *(11) (12)*. Iraq ji billî hewcetiya bi alîkariyên mirovdostane bona vê mebestê, tûşî hatina awareyên sûrî û vegeriyana 46000 welatiyên iraqî ji Sûriyê bûye. Ji ber ku binavahiyên navçeyî heta beriya qeyrana Sûriye û Iraqê lawaz bûne, xizmetên bingehîn ji bo penaberan û kesên aware yên navxweyî li gellek ji civatên mazûvan ji ber lawaziya gellek zêde ya binavahiyan nikare were misogerkirin. Siyaset, abor û civata welatên cînar yanî Tirkiye, Libnan û Urdin bi awayê rasterast ketiye bin bandora pevçûnên çekdarî û wergirtina penaberan û kesên aware yên navxweyî. Tûşbûna bi penaber û awareyên qeyrana Sûriye û Iraqê ne tenê di bin bandora rewşa niha ya siyasî û civakî li welat û civatên wergir bûye, belkî nîşana lihevalyayîbûna heyama dehsalî ya tecrubeya tundiyê hevrê digel rewşa şêrr û rewşên cûrbicûr ên siyasî û etnîkî û girêdayîbûn û têkiliyên mezhebî li Rojhilata Navînê ye.

Dema qewimîna pevçûnan li Sûriye û Iraqê weke pêwendiyên bi welatên cînar ra, ne hevseng, lihevalyayî û cihêreng e. Di heyama şerê li Sûriyê di destpêka sala 2011an da ku li dû Bihara Erebî hat destpêkirin û bilez gurr bû, Iraq zêdetir ji sê dehikan (li pey hev) tûşî pevçûnên çekdarî, serkutkirin û azirandina hin pişkên civakê ji ber cudatiyên siyasî, mezhebî û navçeyî an etnîkî bûye.

Civata Sûriyê beriya destpêbûna şerê çekdarî di asteka jorîn da ji hêla cihêrengiya civakî, aborî, etnîkî û mezhebî bûye ku li kêleka hokarên gelhenasiyê weke temen û zayendê, li penaberan tê xûyanê. Ev taybetmendiyên cûrbicûr li ser hesta sozdarî û girêdayîbûnê li nav civata penaberan bandor dikin û li ser hewcetiyn derûnî-civakî, rêbazên hevsengbûnê û reftara daxwaza alîkariyê li mirovan bandorê dike. Wek mnînak, girîngiya têkilliyên mezhebî û eşîretî dema lawazbûna dewletê zêde bûye *(13)*.

Hejmara zêde ya zarokên ku beriya destpêbûna şêrr li Sûriyê diçûn dibistanê, her wiha kesên ku di dema revînê da û piştra hatin dinyayê û niha di temenê dibistanê da ne, nikarin bi awayê tam ji aliyê civatên mazûvan va li pergala perwerdehiyê bên wergirtin. Ev yek bandoreka nerênî li ser hesta asayîbûnê û asoya pêşberî zarok û ciwanan datîne. Bi giştî rewşa jiyana kesên penaber bi giranî girêdayî bi meyl û xwesteka bo tevlîbûn û entegrasiyonê û derfetên welat û civatên mazûvan e. Li welatên ku beriya destpêbûna qeyranê, têkilliyên çandî û aborî hebûn, ev yek aşkiratir e *(13)*. Pirraniya penaberan li navçeyên bajarî dijîn: Hema bêje sedî 88 li Tirkiyê, derdora sedî 80 li Urdinê û sedî 100 Libnanê –li vî welatî kampên fermî yên penaberan ji bo penaberên sûrî tunene *(14)*. Hewcetiyên wan li warê alîkariyên derûnî-civakî ji ber rewşa jiyana ciyawaz, pirranî cihê digel kesên din li kampan e. Hejmara penaberên ku li rûniştgehên qelebalix û pirr gelhe dijîn berdewam zêde bûye û metirsiya ziyan û zirarê li civata penaberan zêde kiriye *(15)*.

Koma penaberan û hejmareka zêde ya kesên aware yên navxweyî ji Iraqê bi dehan sal e ku ketine ber azirandineka sîstimatîk. Hin pişkên civatê ji ber têkiliyên siyasî, mezhebî û etnîkî yên xwe ketine ber zilm, zor, têror, işkence û kuştinê. Şerê Îran û Iraqê di dehsaliya 1980î da û şerê Kendava Farsê di dehsaliya 1990î da bûne sebeb ku bi sedan hezar kes bibin gorî û gellek kes aware û penaber bibin. Êrîşa Azmerîkayê ya sala 2003an û hilweşandina artêşa Iraqê û têkçûna pêkhateyên dewletî li pey wê bû sebeb ku mîlîtanên dewletî û ne-dewletî derkevin holê ku ji sala 2005an va li gellek navçeyên Iraqê kuştin, destdirêjî, koletî û xela zêde bû. Ev rewş bû sebeb ku pêleka din a mirovên ziyandîtî pêk were – ku pirranî berê xwe dan parêzgehên bakurî yên Iraqê û derveyî welêt. Civata Iraqê demeka dirêj e ku bi awayekî lihevalyayî bi tundî û şidetê hatiye parçekirin û kêşe û nebûna pêbaweriyê li nav komên cûrbicûr ên awareyan her wiha navbera kesên aware û civatên mazûvan nîşan dide. Li nav penaberên iraqî tenê kêmîneyek li nav kampan dijîn; Pirraniya xelkê li bajarên navçeyê li rûniştgehên demkî perrate bûne.

Gellek ji penaber û kesên aware yên navxweyî şehedê komkujî, darvekirin û bombedanîna koma qaşo Dewleta Îslamî (DAIŞ) li axa Sûriye û Iraqê bûne. Gellek ji wan bi neçarî tûşî awaretî, revandin, girtin, işkence û destdirêjiyê bûne. Gellek kesan hejmarek ji xizm û kes û dostên xwe ji dest dane an bi nebûna pêbaweriyê derheq çarenivîsa xwe dijîn. Li kampên penaberan û rûniştgehên demkî û awarte, têkçûna pêkhate û nijyarên civakî, rewşa nebaş a jiyanê û nebûna asoyekê ji bo pêşerojê, pirrî caran dibe sebeba tundî û şideta nû bi taybet li hemberî jin û zarokan. Zewacên bi neçarî, zewaca di zarokatiyê da, destdirêjiyên zayendî û leşfiroşiyên bi neçarî, tê dîtin.

Di rewşa niha ya penaberan da, têgehên ciyawaz ên zayendî û qanûnên civatên wergirê penaberan cuda ji hev in û ev yek dibe sebeba pêkhatina pevçûnan di navbera wan da. Ji billî viya, bi taybet awareyên navxweyî bi taybet ji ber şert û mercên dorpêçbûn, êrîşa li ser nexweşxaneyan û berdestbûna dijwar a xwarek û miqatebûna pizişkî rencê dikişînin. Belengazî û nebûna şolê jî ji hokarên sereke yên kêşesaz ên derûnî civakî ne. Bi taybet komên gellek lawaztir ên civakî berdewam diguherin û rewşa aboriyê bi awayekî berdewam diguherînin. Lewma naskirina kesên lawaztir girêdayî bi analîz û hilkolandina nû ya rewşê. Ji billî jinan û zarokan, ev kom zêdetir li ber ziyan û zirarne: bi taybet ciwan (Tundrê), kesên bi temen, kesên ku kêşeya wan a leşî û zihnî heye, nexweşên rûhî, kesên ku potansiyêla xwekujiyê hene, sêwî, mêr û jinên mayî ji şideta zayendî û komên din weke hevzayendhezên jin û mêr, kesên duzayendî, trans û kesên navzayendî (LGBTI) *(13)*.

Hewildana ji bo diyarkiirna dûhatên derûnî-civakî têkildarî tecrubeyên şideta demdirêj û mayînde ji hêla rêbaznasî û exlaqî va gellek dijwar e. Lêkolîn û pêderxistina balînî ya kêşeyên taybet ên derûnî li nav penaberan pirrî caran bi awayekî bi merc hevseng digel çand û zemîneyê ne, li halekî ku pîvana bandorên bi asta jêrîn da, kiryarên derûnî-civakî ji ber nebûna alavên guncan ên nirxandinê pêk tê. Ji billî viya, li warê revînê, zêdebûna cîbicîbûna xelkê, dibe sebeba lihevalyayîbûna zêdetir a lêkolînên demdirêj.

Li lêkolînên balînî yên derûnnasiya civakî, tu estatîstîkeke pêbawer tune; Encamên lêkolînê bi awayekî berfireh cihêreng e û tenê dikare pêvajoyê nîşan bide. Strês û bêhedariya giran a rûhî, carna hevrê digel xwedaketin û bêhntengiyê li sedî 42 ji civata statîstîkî ya penaberan li Tirkiye û Libnanê hatiye ragihandin *(16)*. Li komeka penaberên sûrî li Tirkiyê, tomarkeran nîşaneyên PTSDyê li her yek ji sê kesan nîşan dan ku numreyên jortir têkildarî jinan û kesên tûşbûyî bi ziyan û zirarên pirtir bûn *(17)*. Li gorî rapora UNHCRê, sedî 8.5ê penaberan li kampa Zaatari`yê li Urdinê ku ji ber kêşeyên derûnî û rûhî tên tedawîkirin, elametên PTBSê li wan tên xûyanê *(18)*. Rapirsînek ji aliyê Koma Pizişkî ya Navneteweyî (2015) va nîşan da ku li kesek ji pênc kesên ku bersiv dan, qaseka hertimî ya tirsa zêde tê xûyanê *(6)*. Bi taybet asta jorê ya berbelavbûna bi qasî sedî 45ê ji bo PTSDyê (û sedî 44ê ji bo xwedaketin) li nav zarokên penaber ên sûrî li Tirkiyê hat dîtin *(19)*.

Bona ku di pêşerojê da ji billî hilkolandinên balînî, pirsgirêkên derûnî û hewcetiyên penaber û awareyên navxweyî jî bikarin bên hilkolandin, divê şêwazên nirxandinê yên heyî ji hêla naverok û zemîneyê va li gorî hev hevseng bibin û cûreyên şeklên cûrbicûr ên nirxandina bandor û têgehên bingehîn weke saxlemiya derûnî û civakî û girîngiya têgeheka giştalî ji saxlemiya derûnî bi awayê berdewam were behskirin.

# 4. Wateya MHPSS li warê pevçûn û awaretiyê çî ye?

Têgeha MHPSSê ku li gotina navneteweyî hatiye berfirehkirin û tê bikaranîn, kurtbûyiya bêyea **„Mental Health and Psychosocial Support“** ye, bi zimanê almanî yanî ``Saxlemiya derûnî û piştgiriya derûnî-civakî``. Ev encama behsa berfireh li ser karên derûnnasiyê ye ku destûrkarên Komîteya Hertimî ya nav ajansê (IASC) bipergal kirine. MHPSS tevahiya wan kiryaran digire ber xwe ku ji bo parastin û baştirkirina saxlemiya derûniya civakî tên bikaranîn. Di eynî demê da, xizmetên piştevaniyê yên cûrbicûr tên raberkirin ku bi hev ra hevaheng in û ji vê riyê hewcetîyên cûrbicûr dabîn dikin.

*Têgeha **„Rihetiyê“** gellek têkildarî saxlemiya derûnî ye , lê nasandin û şiroveya wê berfirehtir e û gellek girêdayî bi ziman, çand û pergala civakî û pergala nirxên kesane ye. Têgeha **„Derûnnasî-Civakî“** berûlayên cûrbicûr ên pêwendiyên mirovî pêkhatî ji aliyên zihnî (raman, hest, reftar) û civakî (çavdêr, rewşa zihnî, çand) digire ber xwe. Têkilliya navbera saxlemiya derûnî û saxlemiya derûnasî-civakî li bêjeya MHPSSê aşkira dike ku bi ti awayî tenê pêwendiyên civakî ji aliyekî va û saxlemiya derûnî ji aliyê din va nagire ber xwe, belkî ev mijar girîng e ku pevçûnên civakî an hewcetî û kêşeyên derûnî hertim divê têkildar digel hevdu werin berçavgirtin û tu yek ji van hêmayan nabe ku li lêkolîn û analîzê neyê berçavgirtin. Saxlemiya derûnnasî-civakî amaje bi rewşeka erênî ya leşî û derûnî dike ku geşatiya mirov dişopîne. Ev yek dibe sebeb ku mirov bi awayekî kêrhatî bi kesên din ra bikeve têkilliyê û ev pêvajoyek ji bo herikbariya mirov di dirêjahiya demê da ye.*

Nêrînên MHPSSê hewldana ji bo parastin û baştirkirina saxlemiya derûnî û civakî ya mirov û sekinîna li hemberî nakokiyên derûnî ne. Piştgiriya munasib û guncan li ser esasa hewcetiya bo kiryarên cûrbicûr û kemilîner pêk tê (IASC) *(32)*.

Nêrînên **Kiryarên dermankirina** derûnî li gorî rêzbaza dermanî ser esasa dîmenên cûrbicûr ên mirovî ne ku her yek ji wan şêwaz û qonxên dermanê raber dikin. Derûndermanî ya kesên tûşbûyî bi tecrubeyên ziyan û zirarê jî têkildar digel aliyên derûnnasî-civakî ye û li pêvajoya dermankirina pirsgirêkên nexweşan fikr û hestên nehevseng û bi kêşe birêkûpêk dike û /an pêwendiyên kêrhatî yên navbera mirovan pêk tîne û diparêze. Bi giştî dermankirin bala xwe dide ser nexweşiyê (kêmasî) her wiha rûbirûbûna bi wê ra û kêmkirina derd û êşê . Derûndermanî tenê divê ji aliyê pisporên hînbûyî va pêk were ku li çarçova dewreya xwe ya fêrbûna kar û girîngtir ji wê di heyama karê pratîkî, tecrubeya derûndermaniyê bi dest xistine.

**Kiryarên rewanpizişkiyê**, yanî dermankirina nexweşiyên derûnî, dermanê derûnî digire ber xwe û ji ber vê yekê divê ji aliyê pizişk an pisporên miqatebûna li saxlemiyê va pêk bên. Li warê xebata digel penaberan, derûnnas û derûnpizişk pirtir hez dikin aliyên derûnnasî-civakî li dermankirinê bi hev ra binirxînin da ku cihêrengî û lihevalyayîbûna derd û êşa nexweşên xwe zêdetir hilkolînin.

Têgeha **„piştgiriya derûnnasî-civakî“** nêrînên cûrbicûr berçav digire ku hêza berxwedayînê, saxlemiya derûnî û şiyana reftara mirovan di asta hestbarî, civakî, manewî û reftarî da xurt dike, bêyî ku ji modêleke dermanî ya pizişkî behreyê werbigire. **Piştgiriya derûnnasî-civakî li warê revîn û şidetê** dil heye cihên ewleh pêk bîne ku gel bikare şiyana xwe ya analîz û hilkolandinê têda berfireh bike da ku tevî hebûna rewşeka bi strês û bi potabsiyêl bona pêkhatina ziyan û zirarê, tecrubeyên bi gef li hemberî xwebawerîyê bi awayekî hilkolîne ku dûhatên astengîçêker di jiyana rojane da heta asteka zêde bên wêdadayîn an kêmkirin. Hewcetiyên taybet ên kesên ku berbihuriya jiyana bi êş û derd hebûne, li vir tên berçavgirtin. Di eynî demê da berûlayên civakî, aborî û siyasî yên derd û rencê tên berçavgirtin.

Kiryarên li warê piştgiriya derûnansî-civakî bi vê rastyiê tên diyarkirin ku ewna berûlayên jêrîn ji bo xurtkirina rihetiya penaberan berçav digirin û wan dişopînin:

- Matîndetiyê xurt dikin û bêhedariyê kêm dikin, bi vî rengî ku di destpêkê da hewcetiyên bingehîn weke parastin, ewlehî û misogerkirina dabînkirina av û xwarekê berçav digirin,
- pêwendiyên navbera mirovan ên kêrhatî ku dibin sebeba pejirîna civakî û piştgiriya dualî, bi awayekî çalak tên xurtkirin û nûvandin,
- çarçovek pêk tê ku têda kes û /an komê ev îmkan heye ku bandor û rola xwe ya erênî li qada civakî tecrube bike û hewcetî, xalên xurtbûn û lawaziya xwe û kesên din têbigihêje,
- çavkaniyên kesane û civakî yên kesê têkildar ku jiyana rojane û pêkvebûna tecrube û nêrînê derheqê xwe û cîhanbîn î bîrdoziyê dikin bin sîvana piştgiriya xwe, tên çalakkirin,
- Xwebawerî, edalet, kontrol û serxwebûn ji nû va tên avakirin,
- pêkanîna armanc û bernameyên jiyanê yên nû ji bo pêkanîna wateyê û zengînkirina jiyanê û hevahengkirina digel nirx û pîvanan (hevpişk digel komeka jêderk û sereke) tên piştgirîkirin.

Beşa mezin a van kiryarên piştgirîkirinê xwedan asteka jêrîn in û pirranî di asta civakê da ye. Armanca wan ev e ku heta radeya pêkan hejmareka zêde ya mirovan bigirin bin sîvana xwe. Pirraniya wan li pişkên tendurustî, perwerdehî û civakî cih digirin an kiryarên beşên din dikemilînin – wek mînak bidestxistina derhatê, jordabirina asta karî, fêrbûna tekmîlî û fêrbûna kar û pêşeyê.

Heke kesek tevî têgihîştina xizmetên derûnnasî – civakî bi asta jêrîn, êdî nikare kêşe û jiyana xwe ya rojane çareser bike, ev kêşeyeka derûnî an nexweşî ye. Ev nexweşî weke hemî nexweşiyên leşî li pergalên pilebendiya navneteweyî tên tomarkirin û bi kiryarên derûndermanî an rewanpizişkî tên berçavgitin *(20) (21)*.

Kiryarên derûnnasî-civakî pirrîcaran ji aliyê alîkarîgihnên civakî[2], mamoste, dermankerên derûnê her wiha kedkarên saziyên sivîl va pêk tên. Ewna divê xwedana vê hêjatî û şiyanê bin ku renge ciyawaz digel fêrkariyên derûndermanî be, lê tevî vê yekê bingehek in ji bo bandora erênî li ser danûstandinên bi talûke yên civakî û alîkariya kesên din ji bo jinûve avakirina nêrîn û cîhanbîniyê ji riya pêkanîna tenahîiyê, bişiyankirin û pêkanîna cihên ewleh û aram ji bo avakirina têkilliyeka kêrhatî û sûdewer.

Ji billî pisportiyên babetî yên taybet (ji wan naskirina teorî/modêlên derûnansiyê, dûhatên derûnnasî-civakî têkildarî pevçûn û awarebûnê, zanista bineghîn û esasî ya hiqûqî, şirove û analîz/têderxistina pirsgirêkê, nêrînên mudaxileyê, belgewarkirin û nirxandin) û zanista zêde ji rewşa siyasî û çandî, hewcedara pisportiyên girîng ji bo kedkarên pispor ên derûnansiyê ye, ku pirranî ji riya hevrêbûna (weke çavdêrî) tecrubeya rawêjkariya kesane û mînaka xwe ya kesayetîyê pêk hatiye. Lewma pişkên navendî li dewreya fêrbûnê ya pisportiyên MHPSSê divê ser bingeha tecrube û xwefikirînê bin. Pisportiyên sereke ev in:

- Şiyana xwefikirîn û amadetiya ji bo hilkolandina deqîq, mînakên fikr, hêz û reftara xwe
- Hevdilî û pisportiyên têkillîgirtinê
- Nêrîna pêşketî û vekirî, hestyar digel çandê û şiyana guherandina asoya pêşber
- Nêrîna beranberîşopiyê, hevgirtî , li gorî çavkaniyan û qahîmker derheqê nexweşan
- Nebûna alîgiriyê, bêterefî û pêbawerbûn
- Şiyana têkilliyên hestyar û bi rêzdarî û kontrola pevçûnan
- Şiyan û meyla bo miqatebûna li xwe
- Şiyana pêkanîna têkilliya digel çavkaniyên xwecihî û xurtkirina wê
- Ronbûna li warê nêrîna derheqê nexweşan

2 Koma karî ya alîkarîgihanên civakî li welatên Rojhilata Navînê bi awayekî hevgirtî pêk nehatiye (Pisportiyên cûrbicûr li her welatekî tên fêrkirin), bi awayekî ku ti rêbazeka standard a PSSê li vir nikare wek bingeh û esasa were berçavgirtin.

Nebûna pişkek ji ronbûn û zelalbûna têgehî ya MHPSSê di rastiyê da kêşeyek mezin ji bo çalakan e. Ya xerabtir ev e ku hejmara xizmetan jî dibe sebeb ku çalakî û asoyên li ber xwedîrol û çalakan zêdetir lihevalyayî bibe. Ya girîng ev e ku rêxistinên ku kedkarên wan têra xwe fêr nebûne bi awayekî tevdigerin ku çalakiyên wan tu pişkeka derûnansiyê (bibandor) tune, û di bin navê MHPSS lê bi beşên cudanebûyî û nebûna ti zelaltî û ronbûna têgehîn a beşan dixebitin. Di eynî demê da li nav gellek ji xwedîrol û çalakên MHPSSê, bi mebesta dûrbûna ji xerabûna navê koma armanc û hêsankirina destgihîştina bo xizmetên alîkarîgihndinê, biryardaneka bi zanebûn li dijî bikaranîna fermî ya nêv pêk tê. Her du dibin sebeba zêdebûna lihevalîtiya beşan û raberkirina yekparçe ya têgeha giştalî û tam a MHPSSê dijwartir dikin.

# 5. Çi têgihîştinek ji ziyan û zirarê divê bingeha hevkariya geşatiya Almanyayê be?

Zemîneya berdewam a gefê û nebûna entegrasiyon û tevlîbûna li komeke jêderk a parastî, hewcedara hevsengbûn û sazbûna nû ya penaberan e. Li gellek babetan, mînakên rûbirûbûna isbatbûyî êdî ji bo çareserkirina kêşe û pirsgirêkên pêşber têrê nake. Gellek ji penaberan ji bo sekinîna li hemberî rewşa dijwar a jiyana xwe hêvîdar in. Wan bala xwe daye ser mayîna lezgîn û pêwîst û carna wer xûya dike ku tecrubeyên azirandin û şopandina ku li pey xwe hiştine, tenê roleka kêlekî heye, lê hertim ev îmkan heye ku ewna girîng bibin. Têgeha PTBS pirranî tecrubeya derd û rencê nexweş nekafî dide xûyanê, ji ber ku hûrbûn li ser elametên nexweşiya taybet û sînordar e1 ku cihêrengî û lihevalyayîbûna tecrubeyên kêşeya berdewam nagire ber xwe. Hûrbûn û xebat dive li ser tecrubeyên cihêreng ên ziyanê, pêvajoyên demdirêj ên tevlîbûna tecrubeyan, hewildana jibo zindîmayînê, ziyan û hewildanên nû jibo rêhatina bi tevahiya van pirsgirêkan be.

Serpişkiya têgihîştina ziyanê nabe ku wek rûdanek tenê digel dûhatên ji pêşve diyarkirî were zanînê, belkî wek pêvajoyeka demdirêj li warekî civakî, siyasî û hiqûqî were berçavgirtinê, ratiya jiyana penaberan nêrîneka statîkî û mînakeka tam a li gorî elametan e ku faktorên zemîneyî yên civakî, siyasî, aborî û qanûnî têda bi awayekî berfireh nehatine berçavgirtin. Ev têgihîştina berfirehtir ji ziyanê potansiyêl û hêzeka nihênî jibo baştirbûna dermana balînî ya nexweşên ziyandîtî li çarçova hewldanên derûndermanî û rewanpizişkî ye. Heke destwerdanên balînî yên kemilîner û an tevlîbûyî bi çalakiyên piştevaniya civakî bin û heke baldariya li dermankirinê lis er dûhatên taybet ên derûnnasî-civakî û taybetmendiyên revîn û awarebûnê bin, hewcetiya koma armanca dikare bi awayekî baştir were têgihîştin û analîzkirin. Hevkariyên geşatiyê yên Almanyayê divê di qonaxa yekem da bala xwe bide ser vê mijarê ku kiryarên piştgiriyê yên derûnansî civakî heta radeya pêkan hejmareka zêdetir a mirovan bigire ber xwe, bêyî ku hewcetiyên balînî yên taybet berçav negire. Ji riya berfirehkirineka kapasîteyê ya bi armanc û li gorî zemîneyê, dive hewcetiya ber bi zêdebûnê li tevahiya bereya MHPSSê were berçavgirtin.


Rêbaza Hans kaylsonê derbarê ziyana li pey hev *(22)* li gorî nêrîna zemîneyî û civakî ya xwe jibo hevkariyên aborî yên Almanyayê pêşeng bûye. Têgihîştina kaêyîlson ji ziyanê wek dûhata heyamên demî yên cûrbicûr, dewsa hûrbûna li ser tecrubeya sereke ya şidetê, dîmeneka berfireh ji pêvajoyên demdirêj û cûrbicûr ên tecrubeyên ziyan û bandorên wê li ser saxlemiya derûnî û civakî raber dike *(23)*. Kayîlson di lêkolînên xwe da derbarê sêwiyên cihû li Holandayê li şerê duyem ê cîhanî têgihîşt ku ne tenê çerxe û berdewamiyên destpêkê, yanî dagirkirina Holandayê ji aliyê dijmin va bi destpêbûna têrorê li djî kêmîbneya cihû, belkî piştî wê şopandina rasterast, derxistina dêbav û zarokan an cudakirina dayîk û zarokan, bi taybet li pey şopandinê, pişkeka berbiçav a tecrubeya ziyanê pêk tîne û ji hêla "gellek ji mirovan wek biêştirîn û bibandortirîn pişka jiyana wan" tê berçavgirtin *(23)*. Kayîlson klarî nîşan bide ku pêvajoya berdewamiyê piştî şêrr derbarê dîmena saxlemiya kesên mayî girîngtir ji ast û giraniya ziyanê li berdeamiyên berê ye *(24) (25)*.

Têgeha Kayîlsonê pêkhatî ji guhertina bingehîn li têgihîştina ziyanê ye:
"Dewsa nêrîna li bûyerekê ku hn dûhat jê ra heneç, me pêvajoyek heye ku têda wesifandina rewşa ziyanê ya guhêrbar, çarçovekê diyar dike ku çawaniya têgihîştina ziyanê derdixe holê" *(25)*.

Ev xala nû ya hûrbûnê li vê pêvajoyê, lihevalyayîtir ji têgeha bûyereka ziyanê ye, lê rewşa bermayiyan baştir pîne dike; Ji ber ku hertim li bara berpirsiyariya civakî difikire ku li gorî berbihuriya Almanyayê xwedan pêwîstiya exlaqî ye. Potansiyêla piştgiriyê ku ji encama vê rêbazê tê bidestxistin, berpirsiyariya sekinîna li hemberî tecrubeyên ziyanê tenê li ser kesê/a tûşbûyî nasepîne, belkî rola civak û siyasetê têda berçav digire. Ev mijar bi taybet jibo hevkariyên geşatiyê xwedan girîngiyeka zêde ye. Bi heman endazeyî, rla siyaset û civakê her wiha ev potansiyêl heye ku berpirsiyarî û di encamê da derd û rencê mirov kêm bike her wiha hevgirtin û pêvajoyên aştiyê misoger bike.

Rêbaza kayîlsonî jibo zemîneya penaberan bi awayê jêrê hatiye berhevdanîn ku ji riya lipeyhevbûnên jêrê, yanî naskirina rewşên ziyanê hatiye wergirtin: *(25) (3)*:

**REVÎN WEK ZIYANA LÎ PEY HEV**
Berfirehkirina têgehekê ji aliyê Hans Kayîlksonî va



Şeş lipeyhevbûnên ravekirî ji rêbaza Kayîlson dikarin ji hêla hûrgilliyan va cihêreng bin û wisa ku tîrikên nuxteyî nîşan didin carna jî paşva vegerin. Lewma dikare bi awayê rêkûpêk bibe sebeba lipeyhevbûna duyem a ziyana revînê û di dema derbasbûna nav welatekî din an li heman welatî li cihekî din bibe lipeyhevbûna sêyem a ziyanê – qonaxa destpêkê ya wê – û bi mayîna demdirêj li vî cihî bibe lipeyhevbûna çarem a ziyanê – demdirêjbûna demkî -. Ya girîng ev e ku haya me hebe ku jiyana penaberan divê wek dûhatek ji van lipeyhevbûnan were naskirin û hertim di bin bandora hokarên siyasî, civakî û hiqûqî da ye. Lewma wek mînak, çaverêtiya vê yekê ku penaber tenê li welatê xwe ziyanê dibînin, şaş e. Tam berovajiya vê yekê, divê were famkirin ku derbasbûna nav welatekî mazûvan ê ewleh ku dikare di lipeyheviya sêyem a ziyanê be, tenê nîşana lipeyheviya din a ziyanê ye, ji ber ku wek mînak nebûna pêbaweriya demdirêj li pêvajoya penabertiyê û pêşeroja nepêbawer dikare rewşeka demkî pêk bîne û bibe sebeba pêbaweriya zêde di lipeyheviyeka ziyanê ya çarem.

Her wiha li qonaxên pêncem û şeşem pêwîst e ku tevlîbûna giştalî (dubare) ya penaberan li civakê (wergirtina dubare) pêk were da ku nebe sebeba dûhatên zêdetir ên ziyanê. Berpirsiyariya civakî û siyasî amaje bi pêkanîna dîmenên pêşerojê û beşdariya civakî jibo bidestxistina hisê ewlehî û girêdayîbûnê. Jibo rihetiya derûnî û civakî ya penaberan û kesên aware yên navxweyî, pêwîst e ku ewna bikarin dema vegeriyanê bi xwe hilbijêrin û kiryarên pêwîst li vî warî da pêk bînin. Dema ku mazûvan û navçeya sereke bi awayekî çalak ji vegeriyana mirovan piştgiriyê bikin, ev dê bibe sebeba rihetî û asayîşa van kesan.

Kiryarên vegeriyanê ku bi awayekî hatine plandarêştin ku bi awayê neçarî bûne gefa li ser kesên li dû sitargehê û kesên li ber ziyanê, û serxwebûna penaberan sînordar dikin an wan berovajiya xwestek û meyla wan neçar dikin, dikarin bibin sebeba jidestdana aliyên ewlehbûyî û bi vî rengî dûhatên din bi xwe ra bînin. Xwebexşbûna rasteqîn, yanî îmkana vegeriyanê an mayîna li civata wergir, pêşmerceka pêwîst jibo jinûveçêkirina pêbaweriyê û pêkanîna dîmena pêşerojê û venihêrîna li kontrol û xwebaweriyê ye. Vegeriyana bêyî dewsgir û birêxistinkirî ji aliyê saziyan dibe sebeba ziyana li hêza biryradanê ya kesên penaber ku ne tenê gefek li dijî wan e, belkî soza civakî ya bo mirovbûn, edalet û hevgitinê jî dixe ber gefê. Dûhatên civakî yên nebûna vegeriyana bi heqaret û bêyî dewsgir gellek zêde ne û atmosfireka siyasî pêk tîne ku rê dide da mêkanîsmên qewirandinê pêk werin.

Eva ku heta çi radeyekê tecrubeya tundî û jidestdanê di rewşa taybet da wek kêşeyeka derûnî û heta wek encamek ji nexweşiyê xwe nîşan dide, bi giştî girêdayî bi hêza biryardana mirovekî her wiha atmosfêra civakî ye. Rewşa hêsanker jibo rûbirûbûna hema saxlem digel derd û rencê dikarin li atmosfêreka civakî ku piştgirîker, têgihîştinbar be û (dubare) were naskirin, bên sepandin û di encamê da nijyara (xwe) baweriyê ya nû pêkan dike ku ne çawanî û kualîteya rencê red dike û ne ziyannasiyê han dide.

Ji rewşa sînordarker em dikarin amaje bi van bebetan bikin: Kêşeyên zêdetir ji wan ne-ewlehî, serşûrî, tecrubeya qewirandinê, têkoşîna nû jibo zindîmayînê û tecrubeyên nû yên neçêbikaranînê, jidestdana kontrolê û xiyanet. Kiryarên derûnansî-civakî divê ji aliyekî va ast û kûrahiya ziyanê bi fermî nas bike û ji aliyê din va divê şiyana kesê ziyandîtî wek mijarên serbixwe bên berçavgirtin û bên piştrastkirin û xurtkirin. Ji ber vê yekê xizmetên derûnnasî-civakî divê li ser esasa tiştên heyî, tevlîbûn û xurtkirina nijyar û pêkhateyên heyî yên malbatê û piştgiriya civakî û di dawî da bifermînaskirin û bişiyankirina mirovên di bin şopandinê da bin, ne tenê têkildarî armancên xebata derûnansî-civakî, belkî li gorî rêbaz û teknîkên pisporî yên bikarhatî.




# 6. Em di rêbazên MHPSSê da li warê şerr û revînê fêr bûne û eva ku çawa dikarin piştgiriya derûnansî-civakî ji penaberan û kesên aware yên navxweyî li warê qeyrana Sûriye û Iraqê pêk bînin?

*Komîteya Hertmî ya Ajansê* (IASC) rêbazek amade kiirye ku ji sala 2007an va wek çarçoveka jêderk jibo xebata derûnansî-civakî li warê qeyran û gengeşeyan hatiye naskirin. Ev rêbaz û modêl çar zemîneyên destwerdana şebekeyî pêk tîne ku bi awayê pîramîdekê hatiye nîşandayînê *(26)*. Ev pîramîd pilebendiyeka kualîteyê nine; Belkî MHPSS di her çar astan da bi awayê hevdem cih tê.

Xebata derûnî civakî li **Warê 1** pirranî pêkhatî ji raberkirina rawêjakriyê bo raberkirên xizmetan e da ku ev kes nêrîna MHPSSê li destwerdana xwe daynin. Ev destwerdan ev in: Dabînkirina kelûpelên bingehîn û nû-avakirina bingehekê jibo misogerkirina hewcetiyên seretayî yên fîzîkî (xwarek, mal, av, miqatebûnên seretayî yên saxlemiyê). Xizmetên navbirî pirranî têkildarî alîkariyên mirovdostane û hevkariyên dirêjdem a geşepêdanê tên raberkirin. Bi cihanîna stratijiya MHPSSê derbarê dabînkirina hewcetiyên seretayî tê garantîkirin ku dûr ji dûhatên nerênî be (wek mînak ji bo girtina pêşiya girîdayîbûn û zêdekirina wê), li ser esasa hewcetî û hesta bo pevçûn û ziyanan rûhî derûnî (wek mînak, li gorî vê yekê ku gelo jin û keçik dikarin bi rihetî biçin destavên li kampên penaberan û wan bi kar bînin û eva ku gelo kelûpelên alîkariyê bi awayekî tên belavkirin ku ji bo wergiran hesta daxwaza alîkariyê pêk neyne) û hestiyariya giştî bo mijarên derûnî û civakî hebe. Ji bo rihetiya derûnî û civakî ya gel, dabînkirina ewlehiya kelûpelên bingehîn ji bo misogerkirina hewcetiyên bingehîn ên fîzîkî pêwîst e.

Bêyî destgihîştina misogerkirî bo çavkaniyên bingehîn ji bo zindîmayînê, gel li ber dilgiranî û kêşeya berdewam derbarê çawaniya misogerkirina zindîmayîna xwe. Mînakeka navçeyî ji vê astê, agahiya ber bi zêdebûnê derbarê rêvebiriya *kampa hestiyar* e. Kiryarên ku li çend welatan pêk tên, pêkhatî ji weşandina bi armanc û birêkûpêk ji bo penaberên nûhatî û sazbûna standardên bicihbûna li kampan ji bo pêkhatina îmkana berhevdanîn û girtina pêşiya pevçûnê ye.

Ji billî alîkariya bo pêkanîna pêwendiyên mayînde, li **Warê 2** mijar pirtir têkildarî pêkanîn an xurtkirina şûnên ewleh ji bo danûstandinên hevpar li civakê û xurtkirina hevgirtina malbatan her wiha kiryarên derhat û karkirinê ye. Projeyên ku li navçeyê pêk tên, wek mînak li warê xurtkirina hevgirtina civakî bi raberkirina şûnwarên gelemperî weke ``Baxên malbatê``, destgihîştina bo bikaranîna têlêfona destan û perwerdehiyên derûnnasiyê ji riya raberkirina projeyên werzişî û mûzîkê bona ciwanan pêk tên.




Li **Warê 3** , piştevaniya bi armanctir û ne-pisporî ji bo kes, malbat an koman ji bo alîkarîgihanên hînbûyî û hevrê, *Kedkarên pişka xizmetên Civakî* û kedkarên pişka ragihandinê tê raberkirin. Li hin welatên mazûvan wek mînak protokolin ji bo rêvebirina qeyranê û destûrkarin ji bo alîkariya xwe ya hatine berfirehkirin û sazkirin.

Li **Warê 4** xizmetên pisporî yên pizişkî ji aliyê pisporên pizişkî û derûnansiyê va ji bo kesên ku ji ber sînordariyên giran ên di jiyana xwe ya rojane da hewcetî bi dermana derûnansî civakî an derûnpizişkiya demdirêj hene, cih digirin. Kiryarên ku vê demê li navçeyê tên bikaranîn pêkhatî ji *xurtkirina* destwerdana dermanî û berfirehkirina pirtir a bernameyên xwendina akademîk e ku ji bo hilkolandina hewcetiyên miqatebûna balînî ya pisporî cih tên.

Modela pîramîdî wek modeleka jêderk a giştalî divê were berçavgirtin ku têda destwerdan bi awayê hevdem li her çar waran da pêwîst e, da ku bikare bersiva hewcetiyên cûrbicûr bide û nehevsengiya koma armanc bi durustî bide ber çav. Pêvajoyeka hestyar li hemberî ziyana rûhî-derûnî li hemî waran pêwîst e û wek stratijiyeka navendî li xurtkirina danûstandinên dualî yên navbera mirovan di jiyana asayî da tevdigere. Ev model nabêje ku kiryarên li warekî taybet ê pîramîdê, bi awayê giştî watedartir an bibandortir ji warên din e. Berovajî, kiryarên munasib û guncan divê ser esasa bingeheka taybet cih bên û heta radeya pêkan bandordanînan wan zêde be. Pîramîd stratijiyeka giştalî ji bo saxlemiya derûnî-civakî ye ku bi wê wateyê ye ku mafên mirovan ji wan saxlemiya derûnî û geşatiya kesane her wiha dabînkirina madeyên bin-

gehîn ên xwarinê, av, parastin, razan û hwd divê hevdem û bi girîngiya yeksan bên berçavgirtinê. Bi têgihîştina vê mijarê, çalakên warê hevkariya geşatiya Almanyayê ku li warê MHPSS û li ser qeyrana Sûriye û Iraqê dixebitin, divê nêrîna xwe li ser pîramîda destwerdanên IASC hûr bikin.


Ji bo sekinîna li hemberî metirsiya şiroveya nedurust a pîramîdê, dibe ku model wel dewsgir wek xizmetên hevpûş were berçavgirtin, ku pişkên wê bala xwe didin ser babetên din, lê di tevahiya waran da hebûna cûreyên pisporan ji bo raberkirina xizmetên miqatebûna derûnî civakî ya giştalî pêwîst e. Li modela dewsgir, li **Warê 4**, ji billî xizmetên balînî, berovajiya pîramîda IASCê, xizmetên din ên tam pisporî jî hatine danandin.

Li zemîneya tundî û revîna mayînde bi van çavkaniyên sînordar ku li welatên wergir hene û bi awayê asayî heta ji bo gelheya herêmî jî piştgiriya derûnî-civakî têra xwe tune, kiryar û xebat divê heta radeya pêkan bi asta bandordanîna berfireh bên plandarêştin. Ev babet bi awayekî asayî bi çalakiyên li ser esasa civatê tê bidestxistin. Li zemîne û rewşên nepêbawer û gellek guhêrbar divê ev yek were berçavgirtin ku drmanên derûnî û rewanî li **Warê 4** tenê divê demekê da destpê bibin ku bikarin bên kemilandin ku derbarê awareyan ji ber rewşa nemayînde ya jiyanê an revîna berdewam kêmtir ev yek dikeve rojevê[3].

Li hevkariya geşepêdanê derheqê qeyrana Sûriye û Iraqê, kiryarên lazim ji bo piştgiriya derûnî-civakî ji penaberan li warê ji 1 heta 3 ku li gorî çavkaniyên sînordar divê bo gellek kesna bên raberkirin, pirranî munasibtir û mayîndetir in.

Tevî vê yekê, ev bi tu awayî bi vê wateyê nine ku piştgiriya derûnî an derûnî-civakî ya taybet di asta kesane da dê hewce nebe. Gellek ji xelkê hin nîşane hene ku teqez hewcetî bi miqatebûna taybet a pisporan heye – lê ji ber rewşa neguncan a miqatebûnê pirranî nepêkan e. Lewma derheqê qewimîna pirsgirêkên ciddî kesin bêyî hebûna zanista derûnasî an rewanpizişkiyê ya taybet, pirranî wek yekem rawêjakr (wek mînak li kamp û dibistanan) dikevin tevgerê. Lewma pêkanîna hestiyariyê derheqê nexweşiyên derûnî û stratijiyên derûnî-civakî, heta li ba kesên çalak ku bi awayekî taybet karê dermankirinê pêk naynin, belkî li warên ji 1 heta 3ê dixebitin, girîng e. Di rastiyê da pirraniya pirsgirêkên derûnî civakî hewcedara destwerdana dermankirina balînî li Warê 4 nînin, belkî ji ber cihêkarî, bêhêvîttî, xem û keser, cudabûna ji koka xwe, belengaziya demdirêj, berdestnebûna xizmetên miqatebûnê her wiha pergala jêderk a civakî ji nav çûne *(27) (13)*. Ev pirsgirêk jî dikarin li sê warên jêra pîramîdê werin berçavgirtin ku di wan da hêzên xwebaştirkirinê yên mirov divê ku bi xurtkirina civatê *(28)* bên xebitandin.

3 Helbet miqatebûnên derûndermaniyê divê ser esasa dermanê derheqê nexweşan (an nexweşiyên zemîneyî yên heyî) jî divê were misogerkirin.


WARÊ 1:
Raberkirina xizmetên hestiyar bi ziyana rûhî-derûnî ku dabînkirina hewcetiyên seretayî û bingehîn weke xwarek, av, miqatebûna saxlemiyê, mal û ewlehiyê pêkan dike.
WARÊ 2:
Kiryarên ku ji bo xurtkirina kom û şebekeyên civakî (malbat, civat, konseya taxê, civînên xwealîakrîkirinê û hwd) tên bikaranîn
WARÊ 3:
Kiryarên piştgiriyê ku kesên pişka cihanînê bi awayekî taybet ji bo wan hatine hînkirin (bihîstina çalak, pisportiyên rawêjkariya bingeh, PFA, têknîkên perwerdehiyê yên ziyana rûhî-derûnî û hwd)
WARÊ 4:
Ximetên derûndermanî û rewanpizişkîyên pisporî her wiha rawêjkariya hiqûqî û rola navbeynkariyê li mewqiyên gurrbûna kêşe û gengeşeya navbera koman

# 7. Hevkariya geşatiya Almanyayê di pratîkê da çawa ye?

Gellek Stratijiyên MHPSSê li xebata digel penaberan hene. Ev stratijî û rêbaz ji temrînên ji bo rêkûpêkkirina xwe û hêjatiya civakî her wiha derbirrîna tevrubeya revînê ji riya şano, helbest, wêne, lîstikên hînbûnê, werziş (spor), reqs, têknîkên aramkirinê heta xizmetên dermanî balînî yên tam pisporî ku bala xwe didin ser ziyana rûhî-derûnî, digire ber xwe. Destgihîştina bo xizmetên hiqûqî her wiha aşkirakirina cinayetan, peydakirina rastiyê û şopandina sûcdaran, beşek ji stratijî û rêbaza MHPSSê ne ku dikarin ji baştirkirina saxlemiya derûnî piştgiriyê bikin. Wek kiryareka guncan û baş ji bo xurtkirina rihetiya derûnî û morala kesên ziyandîtî, avakirina navendên ragihandinê û hevdîtinê hatiye destnîşankirin ku derfetek ji bo pêkanîna têkilliyê digel kesên din e. Her wiha renge li van navendan, rawêjkarî derbarê warên taybet ên jiyanê weke miqatebûna pizişkî an çûyîna zarokan bo dibistanê were raberkirin.

Mînakên jêrê ji Hevkariya Geşatiya Almanyayê dikarin ji bo warên cûrbicûr ên Pîramîda Destwerdanê bên terxankirin:

### Warê 1 – Stratijiyên derûnî-civakî li miqatebûnên seretayî, kelûpelên bingehîn û ewlehî

Armanca wan balkişandina ser mijarin weke pêkanîna hestiyariyê derheqê alîakriyên mirovdostane û hevkariyên geşepêdanê li welatên alîkarîgihan her wiha civatên herêmî, pêkanîna agahiyê, têgihîştin û pejirandina kiryarên MHPSSê (Piştgirî) û li avakirina nû ya pergal û sîstimên xerabûyî (binavahî, perwerdehî, saxlemî û hwd) e û bangewazî û danezana vê yekê ku MHPSS weke mijara navbera rişte û çiqên cûrbicûr were berçavgirtin û kiryar û pêngav bi dûrfikirîn, rêzgirtin û têkildarî hewcetiyên derûnî-civakî yên kesên ziyandîtî pêk bên. Ev hestyarî bi bikaranîna stratijiyên MHPSSê dikarin wek mînak bi riya van babetan bên diyarkirin,

- ziyandîtî li raberkirina xizmetên beşdariyê çalak in û hertim rewşa wan di bin kontrolê da ye,
- cihêkarî û pilebendîkirina goriyan ji riya bikaranîna xizmetan tên wêdadayîn,
- kiryarên pêwîst ji bo dabînkirina kelûpelên bingehîn tên berçavgirtin, kesên ku gellek tûşî ziyana rûhî û derûnî bûne, pirranî ji ber hewcetiya bo wêdaçûnê an ji ber nebûna pêbaweriyê pirranî li belavkirin û parvekirina kelûpelên alîkarîgihan li ber dest nînin, lewma pêwîst e ku riyên din ên destgihîştinê bên vekirin,
- kiryarên perwerdehiyê divê bona balkişandina ser xalên lawaziyê yên kapasîteya analîza agahîyan û hûrbûna ser ciwanên tûşbûyî bi tecrubeyên ziyana rûhî derûnî bên diyarkirin,
- jin û mêrên xwedan tecrubeya şidetê pirranî ji ber tirsa ji cihêkariyê ji pergala saxlemiyê dûr dimînin, li gorî nebûna stratijî û rêbaza ragihandina derûnî civakî yanî stratijiya pişka miqatebûna saxlemiyê.

**Mînakek ji Hevkariya Geşatiyê ya Almanyayê li Rojhilata Navînê.** Projeya Destmizd li berdêla Kar ya ``Guhertina kils û zibilan (erênî) bo enêrjiyê`` di sala 2015an da li welatê Urdinê dest pê bû. Armanca vê projeyê ev e ku bi awayê demkî rewşa derhata penaberan, awareyên navxweyî û kesên li ber ziyanê yên welatên wergir ji riya girêbestên karê demkî garantî bike û hevdem bingehên herêmî û hevgirtina civakî berfireh bike. Zêdebûna berbiçav a gelheya Urdinê li pey qeyrana Sûriye û Iraqê bûye sebeba barekî zêde li ser asta wêdabirina kils û zibilên heyî. Ji billî nebûna çavkaniyên malî ji bo wêdabirina kils û zibilan û paqijkirina kolanan, têgihîştian xelkê li civatên wergir, derbarê vê yekê ku alîkariyên navneteweyî yên malî di dereceya yekem da bo penaberan tê terxankirin an na, dibe sebeba zêdebûna îhtimala qewimîna pevçûnan. Projeya "Guhertina kils û zibilan bo enêrjiyê (erênî)" ji nêrînên derûnî-civakî li hêsankirina karkirinê li beşa berhevkirina kils û zibilan li gorî hestiyariya pevçûnê ji riya pêşengbûna penaber û hewcedaran li vî warî da her wiha ji riya gotûbêja beşdariyê, bi riya tevlîbûn û beşdariya jinan behreyê werdigire. Wek mînak ji riya hatina beşa sivîl û avakirina navenda sûdwergirtina dubare ji kils û zibilan dê mayîndetiya vî karî û guhertina bo karkirina demdirêj misoger bike. Hesta kontrol, tevî sînordarbûna girêbestên karî, ji riya vê projeyê geşatiya zelal, ron û giştalî û birojkirina agahiyan pêk tê ku têda dilgiranî û mijûlatiyên karkeran tên hilêxistin û bersiva wan tê dayînê.

Ji billî viya çavdêrî û beşdariya ji riya cihanîna komên navendî, fîdbeka rêkûpêk, rûdan û mêkanîsma gazindeya bi awayê nenas, pêkan dibe. Piştgiriya ji derbasbûna ji bikarwergirtina demkî bo lêgerîna ji şolê, ji riya rawêjkarî ya hevpeymanên cihêner bi berçavgirtina pisportî û hêjatiyên wergirtî pêk tê. Perwerdehiya saxlemî û ewlehiyê jî divê mafên wergirên xizmetan biparêze.

### Warê 2 – Piştgiriya ji malbat û koman

Kiryarên di vê astê da bi armanca xurtkirina piştgiriya dualî û hevgirtina civakî li nav malbat û koman pêk tê. Avakirina (dubare) ya şebekeyên civakî dikare di dawî da alîkariya yek bi yeka endamên koma armanc ji bo rûbirûbûna xwe ya şexsî digel tecrubeyên berê û kêşeyên niha bike. Pêbaweriya giştalî bo taybetmendiyên çandî û zemîneyî pêwîst e.

Kiryarên jêrê girêdayî bi vê astê ne:

- Tevlîbûna endamên malbatê,
- Hin kampaynya ji bo rûbirûbûna kêrhatî bi berbihurî ra,
- Debara jiyanê-çalakî,
- Rêbazên kontrola malbatê,
- Hêsankirina herikbariya malbatan bêyî tundiyê,
- Komên jinan,

- Klûbên ciwanan,
- Çalakiyên têkildarî perwerdehiya fermî û ne-fermî,
- pêvajoyên şîngêriya komkî,
- Tevlîbûna dubare ya têkoşerên berê li gundan ji riya rêûrismên kevn ên paqijkirin û aştiyê,
- Nûavakirina pêwendiyên civakî navbera komên cudabûyî.

**Mînak "Fûtbal an pêgog wek kiryareka derûnî-civakî":** Wek mînak pêşbirkeka **Fûtbalê** di navebra ciwanan da dikare kiryareka derûnî-civakî ya asta 2 be, bi nêrîneka visa, hevrêtî û amadekirina rewşê ji bo tecrubeyên jêrê yên lîstikvanan pêk tê:

- Hevdilî
- Însaf
- Hevkarî
- Kontrol
- Desthilat
- Hesta girêdayîbûna li komekê
- Berçavgirtina qanûnan bêyî hesta sînordariyê
- Hewildana ji bo rêkarên bêyî tundiyê û bi afirînerî
- Bikaranîna pêwendiyên kêrhatî û stratijiyên bidestxistina armancan
- Refleksa derbarê rûbirûbûna digel hestên xwe
- Hezkirina ji serketin û tamilkirina bêhêvîtiyê di dema serneketinê û hwd.

Ev nikare li pêşbirkekê ji riya fêrkarekî hînnebûyî li warê piştgiriya derûnî-civakî were berçavgirtinê. Ji ber ku li vê pêşbirkê jî potansiyêla zêdebûna fikra dijminatiyê, gef, bêpabwerî, bêpartî û quretiya û zordestiya lîstikvanên takekesî, têgihîştina jidestdana kontrolê û bêşiyanî an serêxwegirtina tundiyê û nêrînên xerab û pîs li dijî tîma hevrik an hevtîmiyên takekesî heye. Li vê babetê em nikarin qala kiryareka PSSê bikin, belkî nêrîna me li pêşbirka Fûtbalê wek hokareka qahîmker a pevçûnan an lawazker a tîmekê an yek bi yekê lîstikvanan e.

**Mînakek ji hevkariya geşatiya Almanyayê Rojhilata Navînê.** Ji sala 2011 an va *Bernameya Cîhanî ya Filitandina Zarokan bi navê (Save The Children)* li Libnanê hin proje xistine bin sîvana piştgiriya xwe ku pergalên parstina zarokan li ser bingeha civakê dişopîne. Hema bêje 1.5 miliyon penaber li Libnanê dijîn – ku zêde ji sedî 50ê wan zarok in. Gellek ji van zarokan piştî revînê hewcetî bi piştgiriya derûnî-civakî hene. Ji aliyê din va Bernameya Cîhanî ya Filitandina Zarokan, têgeha isbatbûyî ya parastin û atmosfêra vekirî bi

kar tîne da ku ji vê riyê hewcetiyên lezgîn û seretayî yên zarokên penaber û malbatên wan dabîn bike. Ev şûnên dostane ji bo zarokan li kêleka navendên navnivîsînê hatine çêkirin û ji riya çalakiyên bi armanc û têgeha atmosfêra ser esasa hewcetiyê rê dide zarokan ku bernameyeka birêkûpêk a amarker biceribînin û careka din hesta zarokatiyê bikin. Hevdem ewna wek xaleka têketinê ji bo çavdêrên hînbûyî ne da ku babetên bi hewcetiyên taybet, tecrubeya tundiyê û neçêbikaranîn an xeterên din ji bo parastina ji zarokan nas bikin û heke pêwîst bike kontrol û birêvebirina babtekê bi kar bigirin. Girêdayî bi taybetmendiyên wan û hevahengiya digel malbatan, hin babet dê bikevin ber destê raberkerên xizmetên pisporî û saziyên hevkar. Hevdem kedkarên pispor li Bernameya Cîhanî ya Filitandina Zarokan, atmosfêrên parastî û vekirî ji bo hînkirina sergêran derbarê metirsiyên parastina zarokan bi kar tînin û derbarê xizmetên miqatebûna ji saxlemiyê wan agah dikin. Wek hêmana duyem, Bernameya Cîhanî ya Filitandina Zarokan ji *Navenda Geşepêdana Civakî* piştgiriyê dike da ku derfetên wê li warê parastina zarokan û raberkirina xizmetên civakî bo wan berfireh bibin. Ev navend divê wek pêkhate û saziyên xwecihî ji aliyê dewletê va ji bo raberkirina xizmetên civakî, pizişkî û derûnasiyê li civatan ji bo penaberan bixebitin, lê pirrî wextan pisportî û îmkan û derfet kêm in. Bernameya Cîhanî ya Filitandina Zarokan alîkarîgihanên civakî li navendan hînî "Têgeha parastin, û atmosfêra vekirî û alîkariyên seretayî yên derûnansiyê" (*Psychological First Aid* – PFA), dike, şebekeyên piştevaniyê bi raberkirên din ên xizmetan pêk tîne û alîkairya navendan dike ku bernameyên cihanînê yên xwe yên xwecihî û navçeyî ji bo berfirehkirina zêdetir a xizmetan pêşda bibin. Ji vê riyê ne tenê beşdarî, belkî qahîmkirina pêkhateyên xwecihî jî tê misogerkirin.

Yeka din ji pêngavên geşepêdanê, damezirandina kom û tîmên gerrok li navendan ji bo destgihîştina bo zarokan li navçeyên dûrketî û raberkirina xizmetên parastinê bû. Ev proje li *Stratijiya Neteweyî ji bo Parastina Zarok û Jinan* li Wezareta karên Civakî ya Libnanê haitye cihgirtin, ku ji riya wê va hevahengî û mayîndetî di asta welêt da tê misogerkirin.

### Warê 3 – Piştgiriya hestbarî û civakî ji bo kes, malbat an koman

Di asta sêyem da, kiryarin piştgirîker hene ku pêka asta 2 hewcetî bi asteka bilindtir a rawêjkarî û xebata pêwendîgirtinê hene. Armanc aramkirin û tebitandina kesinan e ku bi giranî ketine ber şidet, şer an tecrubeya karesatan û kesên ku kiryarên asta 2 di asta jêrîn an bi ti awayî wernagirin. Pirraniya kesên ku ketine bin bandorên navbirî, xwe tenê dikin, lewma beşdarî çalakiyên Asta 2 nabin. Bi gişt, lê ne bi tenê, PFA di vê astê da ye; Têgehea piştigiriyê ji bo kesên ziyandîtî, ku vê dawiyê tûşî gefê bûne.

***Alîkariyên seretayî yên derûnnasiyê ji*** *aliyê karzanên navneteweyî va hatine plandarêştin û armanca wê ji aliyekî va tesbîta têkçûnên hestbarî ye û ji aliyê din va girtina pêşiya ziyana zêdetir ji riya guhdayîna bi hevdilî û hevxemî û piştgiriya ji ziyandîtiyên rûhî-derûnî bi bersivdayîna lezgîn a hewcetiyên wan (29).*

**Mînakek ji Hevkariya Geşatiyê ya Almanyayê li Rojhilata Navînê.** Ji sala 2016an va, "medica mondiale" û "HAUKARI e,v." li Herêma Kurdistana Iraqê mijûlî xebatê ne û ji bo xurtkirina pêkhateyên xwecihî, dewletî û civata şaristaniyetê ji bo rawêjkariya bo jinên ku tûşî şideta zayendî û destdirêjiyê bûne, dixebitin. Ev proje li parêzgehên Dihok û navçeya Germiyanê/ parêzgeha Silêmaniyê ye ku bi dehan hezar ji mêr û jinên ciwan ji sala 1988an va li êrîşa mezin a bi navê Enfalê hatiye kuştin û yên mayî hatin zindanîkirin û piştra bo kampên demkî hatin şandinê. Heta roja îro ji dûhatên şideta berfireh rencê dikişîênin. Ji dema êrîşa "Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê" (DAIŞ) di sala 2014an da, ev navçe ji nû va bû meydana şêrr; Bi dehan hezar penaxwaz ji parêzgehên Enbar, Selahedîn û Diyaleyê hatine vira û hîn jî tu pêşerojeka ron û zelal ji bo vegeriyana wan tune. Li civatên wergir û mazûvan, navbera hevgirtina digel penaxwazan û hêrsbûna ji şidetên berê dijheviyek heye. Ji bo alîkariya bona kêmkirina van kêşeyan û beşdariya bli gotûbêjê, ev proje ji bo jinên ku hem tûşî destdirêjî û şideta zayendî bûne û hem ketine ber tundiyên siyasî/civakî, hem li kampên penaberan û hem li nav civatên mazûvan hatiye berçavgirtin. Ev proje rawêjkariya rasterast digel jinan ji riya tîmên gerrok ên şirîkên xwecihî bi qahîmkirina rêvebiriya dewleta herêmê ji bo têkoşîna dijî şideta li ser jinan va dike yek. Navendin rawêjkariyê hatine damezirandin û parastina polîsî û rawêjkariya derûnî-civakî raberî jinên ziyandîtî dikin. Li çarçova vê projeyê, ev navendên rawêjkairyê ji hêla locistîkî va tên piştgirîkirin.

Kedkarên şirîkên dewletî û yên sivîl, perwerdehî û çavdêriyê werdigirin; Hêzên ewlehiyê û hêzên polîs hîn bûne da bi awayekî hestiyar derbarê ziyana rûhî-derûnî bi jinên ku ketine ber şidetê ra tev bigerin. Li navçeya Germiyanê jî hin hevkarî bi projeyeka HAUKARI'yê ji bo qahîmkirina navendên rawêjkriya malbatê ya dewletî bi asta seretayî û pêkanîna hin şebekeyan ji bo pêderxistina zûdem û pêşîlêgirtina ji şidetên zayendî hene. Rêbaza rawêjkariyê giştalî, ser bingeha çavkaniyan û *Bişiyanker*-e û rawêjkariyên derûnnasî, qanûnî û pizişkî digire ber xwe. Dewreyên perwerdehî û agahkirinê dibin sebeba sînordarkirina cihêkariyê li warê rawêjkariyê. Rêbazên navbeynkariya malbatî ya zemîneyî, ku mêrên malbatê bi awayekî çalak mijûl dike, alîkariya jinan ji bo pêşdabirina nêrînên civakî. Nirxandinên karzanên xwecihî yên vebijartî derbarê pilebendî û geşepêdana zêdetir a zanista xwecihî û rêbazên pratîkî hene. Tevahiya projeyan bi xurtkirina pêkhate û saziyên dewletî, mayîndebûnê misoger dikin. Xurtkirina hevdem a şirîkên civata şaristanî û hevkariya wan bi dewletê ra, dibe sebeba hêsankirina rawêjkariya piştgirê jinan û kişandina balê ser guhertina têkilliyên zayendan.

### Warê 4 – Raberkirina xizmetên pisporî û balînî

Pêkhatî ji rêbazên pisporî yên balînî jin aliyê rewanpizişk an dermankerên rewanê ji bo rûbirûbûna bi şidet û tundiya qewimî, jidestdan, xem û keser, binpêkirina mafên mirov û ziyana rûhî-derûnî. Bi mebesta alîkariya bo kesên ku tûşî nexweşiyên derûnî-civakî an derûnî di astên cûrbicûr bûne û bi mebesta rênîşandana bo wan di rewşa gellek guhêrbar û li ber ziyanê ya jiyana xwe bona vejiyandina pênaseya xwe û

bidestanîna hevsengiya zihnî û vîn û morala ji bo jiyanê, li hin babetan, hewcetiyên pisporan ji bo destwerana li warê têkildar cihê ye: Dermana derûnansiya kesane an malbatî, dermana rewanpizişkî û dermanî her wiha pêşniyarên dermanî. Izna dermanî û pêşniyar û şîretên derûnnasî û dermnaî – divê têkildarî lênêrînên derûndermanî – tenê ji aliyê pisporan va pêk were. Li warê rêbazên hûrbûyî li ser ziyanên rûhî-dermanî, divê ev yek were berçavgirtin ku nabe ku ewna cuda ji zemîneya taybet a kesên ziyandîît bên dîtin. Bandordanîna şêwazekê nabe ku tenha pîvana bikaranîna wê be, belkî divê hevaheng digel rastiya rojê ya kesên ziyandîtî be da ku bikare bandora tebitînê ya berçavgirtî pêk bîne. Rêbazên dermanî ku sekinîna li hemberî tecrubeyên kesane yên renc û êşê wek girîngtirîn mijarê ji bo serketina li hemberî wê dizanin, divê bên hilkolandin û bi zemîneyeka taybet va hevseng bibin. Şiyana cihanîna şêwazeka tam standardbûyî, pirsên civakî-siyasî, navçandî her wiha pirsên têkildarî hegera tundiyê hertim û li her derê berçav nagirin. Rûbirûbûna bi vê mijarê ra divê bi planên destwerdana çendalî pêk bê *(30)*.

**Mînakin ji Hevkariya Geşepêdana Almanyayê li Rojhilata Navînê.** Projeya melhemê ya zankoya pizişkî ya Bêrlînê û Civata Help'ê (Civata tomarbûyî) ku ji sala 2014an va li Urdinê dest pê bûye, bi awayekî yeksan penaberên sûrî û gelê xwecihî ku hewcedariyên wan ên derûnî-civakî hene, berçav digire. Xurtkirina binavahiyên xwecihî ji wan miqatebûnên seretrayî yên rewanpizişkî û derûnasiyê li sê navendên tendurustiyê yên bijartî ser bi Wezareta Tendurustîyê û pêwendiya nêzik bi zêde ji 40 saziyên xwecihî cih tê. Ji billî viya, her salê herîkêm çar dewreyên perwerdehiyê û dewreyên perwerdehiya kemilandî ji aliyê karzanên xwecihî li rûdanên rûbirû û xizmetên online ên birêxistinkirî va tên lidarxistin; û her salê zêde ji 30 rûdanên perwerdehiyê yên derûnnasî û agahkirinê li dibistan û navendên civakî tên lidarxistin. Derûnnas û rewanpizişkên ku li vê projeyê dixebitin, him ji Sûriyê û him ji Urdinê tê. Armanca sereke ya vê projeyê piştgiriya ji mirovan derbarê mafên wan ên bingehîn li warê saxlemiya rûhî ye. *Bişiyankirinji* riya beşdariya li warê cihanîna hevpar bi hevkariya wezareta tendurustiyê û li gorî analîz û hilkoilandina hewcetiyan pêk tê. Naveroka perwerdehiyê hatiye bijartin û xizmetên dermanî bi awayê taybet ji bo komên li ber ziyanê her wiha aliyên taybet ên zayendî û ziyana rûhî-derûnî hatiye berçavgirtin. Ev proje ji billî xizmetên civakî yên seretayî, her wiha rawêjkariyên bi armanc her wiha xizmetên dermanî yên taybetî derûnansî û rewanpizişkiyê û pergala lêvegera kêrhatî digire ber xwe.

### Têgeha giştalî – hevpûşiya temam a çar waran

Ji riya hevdembûna kiryaran (ji bo xurtkiirna xizmetên MHPSS yên heyî li her çar warên Pîramîdê û heke pêwîst bike pêkanîna babetên ku tunene) divê hin xizmet bikevin ber destê penaberan ku hewcetiyên taybet heta radeya pêkan bi awayê berfireh dabîn bike û zextê ji ser kesên alîkar rabike.

**Mînakek ji nêrîna giştalî ya hevkariya geşatiya Almanyayê li Rojhilata Navînê.** Kiryarên alîkariya awarte ku Rêxistina Navneteweyî ya "medico" ji sala 2014an va li Herê-

ma Kurdistana Iraqê piştî êrîşa DAIŞê li bo penaberan raber kiriye, li ser esasa HAUKARI (civata tomarbûyî) û hevpeymanên xwecihî yên navenda jinan a KHANZAD û Binyata Saxlemiya Kurdistanê ye û ji destpêkê va ji aliyê komîteyên xwecihî bi hevkariya pêkhateyên xwealîkar ên penaberan cih hatiye. Ji riya gotûbêja berdewam, hewcetî û kiryarên berfirehbûyî û di pêvajoyê da zêdetir berfireh dibin, li gorî vê yekê ku hertim hewcetiyên derûnî-civakî li ser esasa pêbawerî, hêjatiya dilniyabûnê, tecrubeya şiyana tevgerê û kêrhatrîbûna xwe berçav digire û di eynî demê da pêkhateyên mayînde û qahîm berfireh dike. Li navçeya Germiyanê, Rêxistina Navneteweyî ya medico û civata HAUKARI (civata tomarbûyî) alîkariyên berfireh ji bo zindîmayînê bo penaberên parêzgehên Ensar, Selahedîn û Diyaleyê ku ji aliyê Dewleta Îslamî li Iraqê û Şamê (DAIŞ) va hatine dagirkirin, raber kirine, ev alîkarî ji riya hêsankirina çalakiyên çandî yên hevpar navbera ciuvatên wergir û penaberan pêk tên. Ji riya vê alîkariya li gorî pêvajoyê bo penaberan, rûniştgeheka awarte ya berê û navendeka çandî ya ciwanan li Kifriyê hatiye damezirandin ku hevdîtin û danûstandina navbera ciwanên xwecihî û penaberan (mêr û jin) pêkan dike, bo ku li hemberî tecrubeyên tundiyê, awaretî û zêdegaviyê raweste û ji riya dîmen û xeyalan asoyek din ava bike.

**Mînaka nêrîna giştalî ya karên pratîkî yên derûnî-civakî li Almanyayê.** Navendên dermanî yên derûnî civakî ji bo penaber û goriyên işkenceyê li Almanyayê wek tîmeka çend rişteyî dixebitin da ku di dema herî kin a pêkan da ji aliyekî va alîkarî û nêrînên hiqûqî û derûnî-civakî yên seretayî raber bikin, her wiha pêkanîna şebekeyê ji riya terxankirina rawêjkaran û ji aliyê din va raberkirina dermana pisporî û taybet. Hevdem kedkar wek hêsanker, navbeynkar û perwerdekar li civat û beşên saxlemî, civakî û perwerdehiyê dixebitin *(31)*.

# 8. Çawa rihetiya derûnî-civakî dikare ji riya kedkarên MHPSS va were misogerkirin?

Bingeha piştigiryeka derûnî-civakî ya baş, saxlemiya derûnî û pêşeyîbûşna kedkarên MHPSSê yte, ji wan kedkarên şandî an kedkarên neteweyî yên rêxistinên navneteweyî an rêxistinên hevkar ên xwecihî. Kedkarên MHPSSê her rojê tûşî renc, ne-edlane bûn û binpêkirina mafên mirov li cihên pirranî nearam dibin. Ji bo ku kedkar biakrin di dirêjdemê da yekîtî û nêrînaa hevdilbûna xwe biparêzin, ji hêla pêşeyî va pêwîst e ku her rêxistina MHPSSê ji bo parastina saxlemiya derûnî-civakî ya kedkarên xwe têbikoşe. Tenê pisporên ku dikarin kêşeyên xwe yên şexsî nas bikin û wan çareser bikin, dikarin alîkariya yên din jî bikin ku strês û tecrubeyên ziyana rûhî-derûnî kêm bikin. Bêyî hebûna hêjatiyê ji bo raman û rêforma xwe, ev metirsî heye ku piştgir kêşeyên xwe yên şexsî jî veguhezînin kesên ziyandîtî. Ji bo cihanîna serketî ya kiryaran bona parastina tevahiya kedkaran, rêxistin hewcedara pêşdabirina (li halê pêkanînê) têgeheka rihetiya kedkaran bo tevahiya rêxistinê her wiha hundirînkirin û cihanîna vê têgehê di tevahiya astên (pilebendî) rêxistinê ye.

Xizmetên kêmkirina kêşeyê ku tam li pêkhateya rêxistinî cih girtine, pişkek ji bo alîkariya bo rihetiya derûnî-civakî ya kedkaran hene û rewşê bona piştgiriya dualî ya kedkaran û fîdbeka kêşeyên şexsî dabîn dikin. Ev xizmet divê ji destpêkê va bi başî li pêvajoya kar werin hevrêkirin û girêdayî bi rêbazên xwemiqatebûnê yên kedkaran bin. Ji vê riyê xizmetên dahênerî û livdarî her wiha çavdêriya birêkûpêk (babetî) nirx û bihayê xwe isbat dikin. Ji billî viya pêkanîna atmosfêra fîdbek û sitargehê ji bo pêkvebûna nijyarên *Piştgirî-Yeksan*-di rêvebirina projeyê da mînakeka tevgera baş e. Ev atmosfêr rewşeka ewleh û pêbawer ji bo kedkaran pêk tîne ku têda ewna dikarin hestin weke li ber ziyanê bûn, bêşiyanî an gunehê derbibirînin.

Tevî vê yekê, çalakiyên ji bo kêmkirina kêşeyê bi tenê ji bo parastina kedkaran bes ninin. Bo rêxistinan bi başî rawêjakrî hatiye kirin ku pêkhate û rêbazên xwe bi awayekî durust ji hêla rîskên bi gef li ser rihetiya derûnî-civakî ya kedkaran hilkolînin. Biryardana li warê pêkanîna têgeheka rihetiya kedkaran jî balkişandina ser pêkhateya tîman û herikbariya hundirê rêxistinê ye ku pirranî bingeha civakî ya kar nîşan dide. Lewma rêxistina ku li atmosfêreka civakî dixebite, ji riya pişkbendiya kûr navebra komên civakî (wek mînak li gorî tecrubeyên lihevalyayî yên şidetê) tê diyarkirin, pirranî bi parvekirin û pişkbendiya beranber a hundirê rêxistinê tê diyarkirin. Lewma hewcetiya bo analîz û hilkolandina deqîq a van herikbariyan û berhevdanîna kiryarên kêmkirina kêşeyê ji bo hewcetiyên tevahiya endamên rêxistinê pêwîst e. Ji billî viya rêxistineka karî ya pêşeyî û piştgir jî rewşa xurtkirina mayînde û pêşbînîbar ji bo kedkarên xwe diyar dike. Têkilliya bi pêbaweriya navbera kedkarên cihêner li postên derveyî li pêkhateya navendî, girtina pêşiya dûrmayîna kedkaran li navçeyên dûrketî bi xebata li tîmên hertimî, erkên nasandî yên zelal û sînordariyên erkan di tevahiya mewqioyan da, bikaranîna kedkaran bi berçavgirtina deqîq a rewşa wan têkildarî xizmetên perwerdehiya berdewam a pirtir, rewşa paşvegerînê ji bo kedkaran di tevahiya cihên karkirinê da, zelalbûn û heta radeya pêkan xurtkirina ewlehiya şolî her wiha rêvebiriya ewlehiya pêbawer hin mînak ji wan in. Rola rêbertiyê li cihê karkirinê hokareka girîng li warê saxlemiya derûnî-civakî ya kedkaran e.

Rêberên saziyê roleka bingehîn li cihanîna kiryarên rihetiya kedkaran hene. Ji ber karkerda xwe mînak û nimûne, ewna dikarin reftara bi rêzdarî digel hevkar û koma armanc her wiha şêwaza kontrolkirina xwe bidin hînkirin. Fikra rexneker a kesane li tîmê derbarê ziyanbarbûna xwe û sînordariyên guhêrbar jî pêwîst e. Aşkirabûna ziyanbarbûna rêber û serok, nîşana reftarên ne profesiyonal nine, belkî ji bo parastina kapasîteya şexsî ji bo hevxemî û guhêrbarî û girtina pêşiya nîgeraniya kedkaran têkildarî cihêkariyê li warê raberkirina daxwazê alîkariyê dike. Bi mebesta bişiyankirina rêberî û serokatiyê ji bo piştgiriya ji kedkarên xwe bêyî ku bibe barekî zêde, pêwîst e ku rêxistin wek saziyeka fêrxwaz pêwîstiya cihanîn û berfirehkirina miqatebûna ji xwe û kedkaran fam bike.

Eva ku çawa rêxistinek bi awayekî watedar ji bo piştgiriya derûnî-civakî ji kedkarên xwe têdikoşe, girêdayî bi rewşa taybet a projeyê her wiha rewşa malî ya wê ye. Lewma raberkirina xelata baş bo kedkaran hevrê digel çalakiyên kêmkirina berdewam a kêşeyê, divê beşeka cudanebûyî ji meaş û bûdceya her xebata MHPSS be.

Heta radeya mumkin dirêjtirbûna dema cihanîna projeyan, dikare ewlehiya şolî zêde bike û rewşê ji bo *çêkirina tîm û komêxweş* bike. Ji billî vê yekê, parbendiya munasib a meaş û bûdceya kedkarê bi hêjatiyên cûrbicûr ji bo pêkanîna erkên çenbicûr pêwîst e. Wek mînak, piştgiriya ji kedkarên cihêner li pêvajoyên rêvebirî,, bi taybet li warê daxwaza ji bo wergirtina diravê zêdetir û wergirtina hêjatiya kedkaran ji bo baştirkirina pirsgirêkên (rojane) serketî bûye. Ji billî viya, naskirin û şebekeçêkirina dahêneriyên MHPSSê yên heyî bi çalakên beşa xwecihî û navçeyî dikare bona danûstandina tevgerên baş alîkar be û bi vî rengî asta pêşeyîkirinê zêde dike.



# 9. Xalên bi kualîte û baş ji bo kiryarên siyasî ji bo xurtkirina saxlemiya derûnî û piştgiriya derûnî-civakî çi ne?

Lîsteya jêrê helwêsta giştî ya pisporên navneteweyî derbarê hin xalan diwesifîne ku ji riya wan destwerdana serketî tên diyarkirin û amaje pê dike ku ji kîjan davikan dûrî were kirin *(32) (33) (34)*. Lewma pêşniyar tê kirin li warê plandarêştin û amadekirina kiryaran, derbarê xalên cûrbicûr fikirîn hebe, her wiha ew xal li warê cihanîn û nirxandinê jî bên berçavgirtin. Hêjayî gotinê ye ku ev xal pîvanên statîk û neguhêrbar nînin, belkî ji riya tecrube û behsa li nav pisporan li şûnê berfireh dibin û bi zemîneyê va tên hevsengkirin û carna jî li xebata digel projeyê ji ber nebûna çavkanî û pêdiviyan tûşî sînordariyan dibin. Her wiha li zemîneyekê, navbera hin xalan jî dijhevî dikare pêk were. Lewma berçavgirtina berbend û astengiyan li amadekirina têgeh û mebesta kiryaran, her wiha dikare li cihanînên din alîkariyê bike. Lewma li xişte anku cedwela jêrê ji billî nasandina yek bi yeka xalan, pirsgirêkên heyî li zemîneya taybet û riyên pêkan ji bo rûbirûbûna bi wan ra hatine rêzkirin ku ji aliyê çalakên xwecihî û navneteweyî yên MHPSSê va hatine diyarkirin.

| Hejmar | Xal | Nasandin | Kêşe | Baştirîn rêkar |
|---|---|---|---|---|
| 1 | **Cîhanbînî / Nêrîn** | Li gorî vê xalê, çaverêtiyên xwekêrhatî û **hesta hurmetêli** mirov tê xurtkirin û di her qonaxa destwerdanê da mumkin dibe. Kesên armanc xwedan azadiya tevger û reftarê ji bo biryardan, ***serxwebûn*** **û kontrola xwe** ne ku ji bo sekinîna li hemberî tecrubeya şidet û ziyanê alîkar e. Dîmena pêşerojê vedigere.<br><br>Bi berçavnegirtina vê xalê, penaber wek kesên serbixwe bi hêjatî û çavkaniyên malî nayên naskirin, belkî bi giştî wek beşek ji komeka hewcedarê alîkariyê tên naskirin. Metirsî di demekê da pêk tê ku tecrubeyên jidestdana kontrolê û bêşiyaniya dubarebûyî û girêdayîn pêk tên an xurt dibin. | Hewcetiya bo kedkarên hînbûyî û bi ezmûn ku nêrîneka giştalî û vekirî li Koma Armanc hene û ewna (nêrîn) li hundirê xwe da xwedî kirine, di pratîkê da nikare pêk were. Çavdêriya piştgiriyê pirrî wextan ji ber kêmbûna çavkaniyên malî û însanî nepêkan e. Bandora liv û tevgerên kedkaran li koma armanc kêmtir tên şopandin û aşkirakirin. Ji billî viya, dema kurt a cihanîna projeyan pirranî rê li ber destwerdana çalak û pejirandina biryaran ji aliyê koma armanc va digire. | Plandarêştina têgehê û amadekirina darêştina bernameya projeyan divê ser bingeha hewcetiyên koma armanc be û divê di heyama cihanîna wê da birêkûpêk were handan. Tecrubeya kontrol û serxwebûnê jî dikare ji riya veguhestina berpirsiyariyê û pêbaweriyê were xurtkirin. Wek mînak bi izna destgihîştina malbatên li kampan bo hebûna hitbar û kirêdîta malî ji bo xwe, dewsa dayîna belgeya kopena xwarinê bo wan. Pêbawerî û piştrastbûn her wiha zelalkirin û ronkirina xebat, pêvajo û biryarên rêxistinê, pêşmercên pêkanîna pêbaweriya dualî ne. |

| Hejmar | Xal | Nasandin | Kêşe | Baştirîn rêkar |
|---|---|---|---|---|
| 2 | **Mafên mirov** | Li gorî vê xalê ev kiryar dibêje ku mafên mirovan nikare bê istandin û tam serbixwe ji rewşa welatîbûn û rewşa mayînê bêyî ti sînordariyekê dikare cih were *(35)*. Li ser vê esasê „**mafê** herîpirr yêsaxlemiya rûhî (…) **yê li ber dest ji bo her** kesî " heye.<br><br>Bêyî berçavgirtina vê xalê, pirsgirêka dikare çareser bibe ya komên taybet ên civakî weke penaxwaz an kesên bêyî rewşa mayîna qanûnî, hîn jî pirranî ne edlane tê zanînê, lê divê tenê bi berxwegirtina hin kiryaran were reformkirin. Nêrîna mafê mirov nikare were diyarkirin. | Stratijiya mafên mirovan renge li hin waran da tûşî berxwedan û astengîderxistinê were, ji ber ku kokên wê li nêrîna rojavayî û bi awayekî dijhev digel têgehên xwecihî weke hevgirtina civakî her wiha nirxa malbat û civatê ye. Cihanîna pîvanekê dikare bibe sebeba kêşeyek navbera hestiyariya çandî û xurtkirina asta mafên mirovan ku li ser şiyana biryardana kesane pêgiriyê dike. | Bi bikaranîna têgehên xwecihî û civatê û piştgiriya dualî, her rêxistineka cihanînê divê xalên exlaqî ji bo xebatê hebe. Ji billî vê yekê, Koma Armanc divê ev derfet hebe ku xeletî û rêderketinên hitmalî derbarê ziyanên lêketî li izet û hurmetê ragihîne. Ji billî viya, divê rikeberiya li ser wergirtina çavkaniyan were wêdadayînê, her wiha divê hevgirtin û vîna ji bo wergirtina maf were xurtkirin. |
| 3 | **Hevsengkirin / berhevdanîna digel rewşa niha** | Meşandina xebatan li gorî hewcetiyan **li gorî vê xalê, kiryara** (li ser esasa nirxandinên navneteweyî li pişka) diyarkirî û li **gorî û bi awayê kemilîner** bernameyên çalakên neteweyî û navneteweyî tevdigere. Ev yek, pêkhate û bernameyên **li gorî civakêbi** hev ra dike yek û metirsiya pêkhatina nijyar û pêkhateya paralel û hevtûş pêk nayne.<br><br>Bi berçavnegirtina vê xalê, ev kiryar destwerdaneka serbixwe ye ku analîza destwerdanan/çalakan beriya wê pêk nehatiye û lewma metirsiya dubarebûna destwerdanên niha û rikeberiya bi wan ra heye. | Bi giştî hevahengiya (neteweyî ya) çalakên MHPSSê û hevsengbûna digel rêxistinên dewletî kêşeyek e. Ji billî pêkhatina şebekeya navbera xizmetan, ku lêvegera bêyî kêşeyê pêkan dike. Ji bo girtina pêşiya rikeberiya navbera kiryaran, pirranî nebûna standardên hevpar ji bo destwerdanên MHPSSê heye. Berpirsiyarî ku ji welatekî heta welatê din cihê ne û pirranî li nav wezaretxaneyên cûrbicûr (ji wan saxlemî, perwerdehî, xizmetên civakî) û jêrdestên wan hevpar in, hevahengiya destwerdan û xurtkirina zelalbûna têgehîn li beşa MHPSSê lihevalyayîtir dike. | Li plandarêştin û bernamedanîna kiryaran divê ku standardên navneteweyî û stratijiyên neteweyî bên berçavgirtin. Hevahengî û hevkariya çalakên beşên alîkariyên insandostane û alîkariyên geşepêdanê divê zêde bibe. Birojkirina birêkûpêk qaşo. 4W-Mappings (çi kesek çi karî dike, li ku û kengê) dikare alîkar be. Her wiha qelaşên hevahengiya navebra kedkarên cihêner, rêvebirî û raberkeran divê were naskirinê. Hevkariya navbera çalakên navneteweyî û xwecihî li gorî nêrîn û rêbaza wezaretxaneyên têkildar û bi xurtkirina nijyar û pêkhateyên xwecihî her wiha hevkariya navbera rêxistinên dewletê rê li ber çendparbûna zêdetir a beşê digire. |
| 4 | **Hstiyariya çandî û derdorê** | Bi berçavgirtina vê xalê, kiryar xwe ber bi şêwazên sûdmend **li gorî çandê û hestiyar derheqê zemîneyê** dimeşîne ku ji bo çalakên xwecihî û navneteweyî bibandor û binirx tê zanîn.<br><br>Bi berçavnegirtina vê xalê, kiryara li gorî nêrînên destwerdana giştî wêda diçin û navbera wan û nêrînên xwecihî rikeberî pêk tê. Nêrînên rojavayî bêyî tevlîbûna nêrînên munasib digel çand û zemîneyê an sazbûnê tên wergirtin. | Civat û malbat roleka girîng li xebata MHPSSê hene. Metirsiya cihêkariyê li derdorê û nebûna têgihîştinê li nav civakê dikare rê li ber lêîgerîna li xizmetekê ji aliyê kesên ziyandîtî va bigire. Nêrîn û nirxên kevnare û qedîmî diakre heta radeyekê li dijî kiryarên MHPSSê ji bo xurtkirina komên li ber ziyanê bin û renge bibin sebeba hesta nepêbaweriyê. Zemîneya mezhebî û çandî ya kedkaran dikare ji bo bidestxistina armancên komê girîng be û bîrdozî û bingehên wê yên nihênî li ser xebatê (derûnî-civakî) bandorê dike. Koma Armanc jî ji hêla çandî bi nehevsengbûneka gellek zêde tê diyarkirin û li ser esasa bingeha mezhebî, siyasî, erdnigarî, civakî û aborî cihêreng e. | Ji riya gotûbêja nihênî digel endamên Koma Armanc û beşdariya kedkarên xwecihî li plandarêştina têgeh û cihanînê, dikare rê li ber kêşeyên nihênî bê girtinê. Cihêrengiya mezhebî û çandî, her wiha hestiyarkirina kedkaran (têkildarî xeterên cihêkariyê) dikare zêdebûna dilgiraniyên nihênî yên Koma Armanc ji pêş va berçav bigire. Rûbirûbûna li ser esasa pêbaweriyê digel Koma Armanc û dermana bi hestiyarî ya mijarên bingehîn, ku li ser pêkhateyên malbatê bandorê dikin, pêwîst e. Hilkolandina şêwazên kevnare û stratijiyên sekinîna xwecihî li ser bandorên derûnî-civakî yên wan û têkilliya digel nêrîna komkî dikare hêviyê xurt bike. Kiryarên bi armanca guhertina civakî divê her wiha têkildarî malbat, ol û siyasetê bin û ji riya beşdariya kesên girîng ên xwecihî xurt bibin. |

| Hejmar | Xal | Nasandin | Kêşe | Baştirîn rêkar |
|---|---|---|---|---|
| 5 | **Beşdarî, xwedîbûn** | Bi berçavgirtina vê xalê, analîza dijhevî û zemîneyê beriya berfirehkirina vî karî pêk tê ku **jin û mêrên Koma Armanc** digire ber xwe. Kiryar **hevrê digel nûnerên penaberan an civata armanc** pêş dikevin ku ser xêra wergirtin, xwedîbûn û mayîndetiya projeyên hatiye plandarêştin.[4] Ev kiryara ji aliyê nûnerên Koma Armanc va tê raberkirin.<br><br>Heke ev xal neyê berçavgirtin, plana kiryarê tenê berê xwe dide bernameyên lêkolînî an tecrubeyên li zemîneyên din. Rewşeka taybet a zemîneyeka taybet nayê berçavgirtin. Kiryar bi beşdariya nûnerên penaberan nayê plandarêştin an cihanîn. | Li gorî kêmbûna çavkaniyên mirovî û malî, dema kurt a projeyê û nebûna guhêrbariya cihanînê (bi taybet li rêxistinên ku xebata wan gellek lihevalyayî ye), beşdariya Koma Armanc tenê li babetên gellek kêmdîtî diqewime. Bi giştî analîz û lêkolîna hewcetiyên giştalî û lihevkirinek derbarê rêbaza hevsengkirina destwerdanan tuneye. Raberker nêrînên ser esasa civatê ku bingeha wan zemîneyên din in, vedibijêrin. Bona Koma Armanc, beşdarî ji ber cihêkariyê têkildarî MHPSSê dijwar dibe. Her wiha beşdariya dêmokratîk li tevahiya civatan tune û renge di hin rewşan da gellek zêdetir bê xuyanê. Têkilliya komên li ber ziyanê gellek dijwar e, komên ku herikbarî û tevgerên wan ji ber hokarên civakî an erdnigariyê sînordar e. Ev bi wateya hilbijartina dubare ya kesên taybet û dûrketin û tecrîda kesên li ber ziyanê ye. | Hewcetiyên Koma Armanc divê bi awayekî berbiçav plandarîştina têgehê û cihanîna destwerdanan kontrol bike. Ev di rewşekê da tê hêsankirin ku analîz û lêkolîna hewcetiyan beriya wê bi dawî hatibe û çavdêriya kualîteyî ya beşek ji projeyê be û ji riya raberkeran va were daxwazkirin. Ji billî viya, beşdariya tev rêxistinên xwecihî li ser esasa civatê û hînbûnaa kar û perwerdehiya kemilandî ya kedkarên xwecihî tê raberkirin. Bi têkilliya rêkûpêk navbera Koma Armanc û civatê (wek mînak ji riya komên navendî, qaremanên xwecihî) diyarkirina pênaseyê bi kiryarê tê hêsankirin. Pêkanîna hestiyariyê dikare ji riya projeyên ezmûn û ceribandinê jî cih bê. Bi gitşî,divê hokarên bêhedarker ên zêdebarî an hestiyariya daxawza zêde ku ji riya beşdariya çalak va pêk tên, bên wêdadayîn. |
| 6 | **Cihêrengî û giştalîbûn** | Bi berçavgirtina vê xalê, kiryar **giştalî ye** û bi aşkiratî **hewcetiyên komên li ber ziyanê** (wek mînak jin, zarok, kesên temendirêj, ciwan, kesên nivîşkan û kêm-endam, kesên zêdeghav an kesên ku renge xwekujiyê bikin, hêtîm û kesin bi nêrînên cuda weke LGBTI) digire ber xwe. Kiryar **nehevsengiya Koma Armanc** berçav digire û vê rewşê li plandarêştineka destwerdanê bi awayê ciyawaz berçav digire.<br><br>Heke ev xal neyê berçavgirtin, tometbarkirina neasayî ya kesekî/ê an komekê pêk tê (wek mînak, "Penaber gişt tûşî ziyana û xisara rûhî-derûnî ne") ku dikare ji aliyekî va cihêkariyê pêk bîne û ji aliyê din va li dijî zêdekirina çavkaniyan raweste. Hewcetiya komên li ber ziyanê nayê berçavgirtin. | Di pratîkê da, destgihîştina bo komên li ber ziyanê renge ji ber hegerên erdnigarî, siyasî, civakî, aborî an çandî sînordar be. Cihêkarî û tecrîda heyî dikare zêdetir bibe. Bi vî rengî, renge rikeberiya ji bo çavkaniyan navbera komên li ber ziyan û xisarê (ji wan civatên wergir) pêk were ku ji aliyê balkişandina rêxistinên (navneteweyî) li ser komeka armanc zêde bibe. Ev dibe sebeb ku cihêkarî û metirsiya pevçûnê zêdetir bibe. Kedkar heta radeyekê navbera bêalîtî û nêrîn û nirxên xwe an civakê da dimînin. Ji billî viya, pirrî wextan cîgeha hevpar a rêxistinan nayê dîtin. | Giştalîbûn divê li warê plandarêştina destwerdanan da xwedana ewlewiyetê be û destgihîştina wan wê divê ji hêla stratijîk va were berçavgirtin. Bi awayekî taybet, ji bo destgihîştina baştir bo navçeyên dûrketî, hevkairya navbera rêxistinên xwecihî û navneteweyî, wek mînak birêxistina rawêjkairya têlêfonî digel bijardeyên serîlêdanê, dê sûdewer be. Ronkirin, her wiha raberkirina xizmetan bo civata mazûvan û penaberan dikare hema wisa xwedan bandora hestiyarîçêker û girtina pêşiya pevçûnê be. Serketina giştalîbûna çalak divê wek armaceka hundirîn a rêxistinê be û bi awayê berdewam were ceribandin. |
| 7 | **Zayend – Hestiyarî** | Bi berçavgirtina vê xalê, li warê plandarêştin û cihanîna kiryarê dê piştrastbûnek pêk were ku hewcetiyên taybet û cihê yên **mêran û jinan** tên berçavgirtin, wek mînak derbarê rûbirûbûna bi tundiya zayendî ya tecrubebûyî an tundiya li dijî zayendeka taybet û hwd.<br><br>Heke ev xal neyê berçavgirtin, kiryar bi awayê nerasterast vê îhtimalê dişopîne ku jin û mêr bi awayekî yeksan û beranber jê sûdê werdigirin. Ev yek bala xwe nade hewcetiyên taybet ên mêr û jinên ku pêştir tûşî şidetê bûne. | Xebata li ser civata armanc, tûşî gellek berbendên civakî û siyasî ye ku li gorî zayendê cihê ye. Nirxên kevneşopî dikarin rê li ber beşdariyê bigirin (wek mînak dema ku jin bêyî hevriyek din nikarin ji malê derkevin/mêr nabe ku xwe lawaz nîşan bidin) an ji ber pilebendiyên nû li pergalê (malbat) bibin sebeba pevçûnan. Zayenda kedkaran jî dikare li ser beşdariyê bandorê bike. Di eynî demê da, destwerdan kêmtir caran digel hewcetiyên zayendî saz dibin. | Destwerdan divê li plandarêştin û rewşa çarçova xwe, hewcetiyên cûrbicûr ên jin û mêran berçav bigirin û astengiyên berdestbûnê (wek mînak xizmetên miqatebûna li zarokan) berçav bigirin. Kedkar jî divê derbarê bandora xwe ya zayendî agah bibin. Di baştirîn rewşê da, rêxistin û sazî hin miqatebûnan bi saya bikaranîna kedkarên jin û mêr dabîn dikin. Nîgeraniya derbarê civata armanc jî divê ku di pêvajoya cihanînê da were berçavgirtin. |

4 Eğer hedeflenen müdahalede güncel MHPSS katılımcı çalışmaları varsa, hem aynısını yeniden yapmamak hem de mültecileri gereğinden fazla yormamak için, kullanılmalıdır.


| Hejmar | Xal | Nasandin | Kêşe | Baştirîn rêkar |
|---|---|---|---|---|
| 8 | **Ziyan û xisara rûhî-derûnî – Hestiyarî** | Bi berçavgirtina vê xalê **hewcetî û taybetmendiyên kesên bi tecrubeya bi potanssiyêl û nihênî ya ziyana rûhî-derûnî** li plandarêştin, cihanîn û nirxandina kiryar û xebatan tên berçavgirtin. Rê li ber pêkhatina ziyana rûhî-derînî ya dubare an xurtkirina kêşeyan tê girtin.<br><br>Heke ev xal neyê berçavgirtin, kiryar hewcetî û taybetmendiyên kesên bi tecrubeya ziyana rûhî-derûnî nagire ber xwe. Ev dikare bibe sebeba pêkhatina ziyana rûhî-derûnî ya dubare. | Pirrî wextan hestiyarî li nav kedkaran derbarê dûhatên hestbarî û reftarî yên ziyana ihtimalî û hewcetiyên têkildarî wê li kesan heye. Heke bertekên kesane li hemberî tecrubeyên nihênî yên ziyandîtinê neyên berçavgirtin, komên armanc bilez nexweş û bêşiyan dibin. Nebûna zanist û cihêkariyê dikare bibe sebeba zêdebûna kêşeya li ser civata armanc û kedkaran û bi awayê berdewam xebata wan sînordar bike. | Hestiyariya hemî kesên ku têkilliya wan bi Koma Armanc ra heye, dikare agahiya ji bandora xebatê jî zêde bike. Standardên têkildarî rûbirûbûna digel kesên ziyandîtî divê li rêxistinê bên xwedîkirin û ji aliyê rêvebir û raberkiran va bên daxwazkirin. Pêbawerî û rêzgirtina li xalên hêzê û çavkaniyên kesane yên ziyandîtiyan, dikare jiyaneka kontrolbûyî li her du aliyan pêk bîne. Çavdêriya (koma wekhevan) û hevahengiya ji bo lêvegera li xizmetên pisporî dibe sebeba kêmbûna zexta li ser kedkaran. |
| 9 | **Nebûna ziyan/pevçûnê – Hestyarî** | Bi berçavgirtina vê xalê, xala nebûna ziyanê tê berçavgirtin. Rê li ber dubarebûn û qelaşa li warê miqatebûnê tê girtinê. Bandorên nerênî yên çaverênekirî **û nihênî tên berçavgirtin, diyar dibe ku ev bandor ji ku ne û kiryarên baldariyê ji bo pêşîlêgirtin/kêmkirina** bandorên çaverênekirî pêk tên **(wek mînak xurtkirina pêkhate û nijyarên hêz û şiayan heyî, vebijartina komeka taybet pêka yên din an nebûna reftara beranber û yeksan digel komên cûrbicûr, cihêkarî ).**<br><br>Heke ev xal neyê berçavgirtinê, xala nebûna ziyanê nayê berçavgirtin. Analîz û hilkolandina bandorên nihênî yên nerênî pêk nehatiye û îhtimala pêkhatina ziyan û azzirandinê zêde dibe. | Ziyana li civata armanc pirtir di demekê da diqewime ku kiryar hevtûş digel hewcetiyên penaber û civatên mazûvan nînin, an heke destwerdan bi awayê babetî û li gorî bingeh û zemîneyê nebe. Dûhatên nerênî jî bi reftara bi zirar an bi cihêkarî ya kedkaran digel kesên ziyandîtî, an ji riya nirxandina nivîşkan a hêjatî û sînordariyên wan pêk tên. Ziyana li kedkaran di demekê da pêk tê ku piştgiriya rêxistinî tunebe an xebat gellek zêde be. | Pêbawerî û rêzgirtina li xalên hêzê û çavkaniyên kesane yên ziyandîtiyan, dikare jiyaneka kontrolbûyî li her du aliyan pêk bîne. Çavdêriya (koma wekhevan) û hevahengiya ji bo lêvegera li xizmetên pisporî dibe sebeba kêmbûna zexta li ser kedkaran. Bername hertim divê li gorî zemîneyê, nijyarên xwecihî (jêrbinayî) û endamên civata mazûvan xurt bikin. Divê rê li ber pevçûnên xwecihî û navçeyî ku ji ber vebijartin an berçavnegirtin/berçavgirtina yekalî (navneteweyî) ya komeka taybet pêk tên, were girtin. Ji billî viya pevçûnên navbera bermayiyên şidetê digel hokar/dijberan li projeyên gotûbêja çend etnîkî/mezhebî divê bi baldariyeka zêde were hilkolandin. Destûrkarên têkildarî reftara kedkaran li rêxistinekê divê pêwîstdar û bi neçarî bin. Bi taybet bi cihanîna ispartina bo derve, rêxistin divê ji nêzik va projeyên xwe hevrêtî bikin û fîdbeka xwe raber bikin û heke pêwîst bike. Gazinde û skalayan ji komên armanc werbigirin û mafên wan bi awayekî zelal û ron ji wan ra bêjin. |

| Hejmar | Xal | Nasandin | Kêşe | Baştirîn rêkar |
|---|---|---|---|---|
| 10 | **Çavdêrî û nirxandin û rênimûniya guhêrbar (çavdêrî, nirxandin, berpirsiyarî û hînbûn – MEAL)** | Bi berçavgirtina vê xalê **Çavdêriya bi beşdarî** hevrê digel pêvajoyê tê pêşbînîkirin (Wek mînak fîdbeka birêkûpêk ji komên armanc, çavdêriya berdewam a kedkarên MHPSSê, nirxandina encaman), ku pêvajoya projeyê ji riya encamên bidesthatî bi pêşva dibe. Çavdêrî divê bêyî berçavgirtina zayenda mirovan û bi hûrbûna li ser koma li ber ziyanê pêk were. Atmosfêra plandarêştina guhêrbar û rihet ji bo **hewcetiyên kesane li zemîne û bingeha projeyê** heye.<br><br>Heke ev xal neyê berçavgirtin, agahiyên têkildarî dûhatên nebaş li qeyranan an rewşa piştî qeyranê ku dikare li ser projeyê bandorê bike, nayê berçavgirtin (wek mînak *tundiya ji aliyê şirîkê (partner) nêzik* pirranî li kampan zêde dibe). Fikr û endîşeyên têkildarî pêvajoya dosyeyê û rêderketina ji bernameya destwerdanê ji riya kiryara seretayî û destpêkî/fîdbeka ji komên armanc va nehatiye pêşbînîkirin. | Di pratîkê da, pîvanên guncan û munasib, li gorî zemîneyê û pêbawer û amûrên pîvandina serketinê pirrî caran tunene. Li pirraniya babetan, destpêkê hewcetî bi nasandineka yekîne ji rihetî û baştirbûna wê heye. Analîz û hilkolandina hewcetiyan ku pêştir pêk hatiye û pîvandina demdirêj a bandoran gellek kêm pêk tê. Rapirsînên kêmhejamr ku ji aliyê pirraniya raberkiran va tên piştgirîkirin, xebata MHPSSê bi giştî aşkira nakin û cihêrengiya amûrên berhevdanînê nepêkan dikin. Xebata nirxandinê ku bi giştî wek barekî zêde ji aliyê kedkaran va tê berçavgirtin, ji ber kêmbûna çavkaniyan û guhêrbarîya rêxistinan kêmtir caran li ser cihanîna din a kiryaran bandorê dike. | Di salên bihurî da hejmarek ji çarçovên jêderk ji bo MEALê hatine berfirehkirin *(36) (37)*. Bi mebesta nîşandayîna guhertinên erênî û naskirina zûdem a bandorên nerênî û neçaverêkirî di qonaxên seretayî da, destwerdana birêkûpêk a koma armanc û bikaranîna mêkanîsmên fîdbek û bersivdayînê dikare çavkaniyên zêdetir ji bo MEALê dabîn bike ku hevsengiya li pêvajoya cihanînê hêsan dike. Li gotûbêja bi raberkiran ra ji riya zêdekirina danûstandina agahî û zanyariyan, îmkana berfirehkirina çarçovên dewsgir ên MEALê heye ku li gorî zemîneyekê ye ku têda kiryar cih hatiye. Ji billî an dewsa modelên xetî weke frîm û çarçovên seretayî, ewna her wiha dikarin weke şêwazên hetûş digel proseskirin û hilêkolandinê, kualîteyî bin. Bona ku me zexta herîkêm a mumkin ji aliyê raberkiran va hebe, berçavgirtina kiryarên MHPSSê yên tayebt û hevtûş digel komên armanc gellek girîng e. |
| 11 | **Rêbaza çendalî** | Li gorî vê xalê rêbaza çendalî derbarê IASCê tê berçavgirtin. Xizmet **giştîşop** e û hewcetiyên cûrbicûr **ên civata nehevseng û cihêreng digire bin sîvana xwe**. Miqatebûna hestiyar bi ziyana rûhî-derûnî û hestiyar bi pevçûnê bi dabînkirina kelûpelên bingehîn her wiha xizmeta bo civata bi asta kêm her wiha rawêjkariya armancdar ji bo komên taybet ên armancê û xizmetên dermanî yên balînî yên pisporî heye.<br><br>Heke ev xal neyê berçavgirtinê, kiryar yekalî ne û tenê raberkirina xizmetên pisporî yên dermanî an xizmetên ser bingeha civakê bi asta kêm digirin ber xwe. | Diyarkirina mewqiya kafî li ser pîramîda IASC bi sînordariyên guncan û îmkana kiryara şexsî, hewcetî bi hilkolandina deqîq a projeyan bi nêrîna giştalî ya MHPSSê heye. Çendalîbûna xizmetan her wiha hewcedara şebekeyên serketî ji çalakan ji wan danûstandina zanist û agahiyan û mêkanîsmên lêveger ên kêrhatî ye (wek mînak navbera destwerdanên li gorî civatê di asta 2 û kiryarên pisporî yên asta 4). Bûrokrasiya lihevalyayî ya rêxistinan û parvekirina beşan, vî karî dijwar dikin. | Hewcetiya koma armanc divê bi awayê babetî û bi diqet bê hilkolandinê. Li ser vê esasê, sazbûna munasib a kes an komekê digel kiryarekê tê raberkirin, her wiha veguhestina navbera kiryaran di astên cûrbicûr ên pîramîdî tên organîzekirin. Beriya plandarêştina têgeha kiryaran divê ku hilkolandin û nirxandina giştalî ya çalakan pêk bê. Kedkarên divê derbarê kiryarên çalakên din agah bibin û wek mînak ji riya komên hevahengiyê yên hevpar digel wan bikevin têkilliyê da ku bikarin xizmetên (kemilandî)yên çalakên din bigihînin ber destê ziyandîtiyan. |
| 12 | **Lêveger – Şêwaz** | Li gorî vê xalê **pêkhateyên wergirtin/jêderk** ji bo babetên balînî yên giran hene. Vegerandina bo kedkarên pispor ên klînîkê û xizmetên din pêkan e. Bi vî rengî, hewcetiyên civakî û li gorî civatê li navendên klînîkî tên berçavgirtinê.<br><br>Heke ev xal neyê berçavgirtinê, projeya mêkanîsma lêvegra munasib ji bo her cûreya hewcetiyên pêkhatî li xebata projeyê dê wernegire û renge raberî koma armanc digel kesên çavdêr û zîrevan neyê kirin. | Hevahengiya navbera yek bi yeka çalakên MHPSSê ji ber .. bûyîna beşa MHPSSê gellek lihevalyayî ye. Ji ber guhertinên berdewam ên kedkaran û demkurtbûna projeyan, riyên ron û zelal ji bo lêvegera bo xizmetên din gellek kêm pêk tên. Zexta gellek zêde li ser tevahiya sîstim û xizmetan dibe sebeba nepejirandina daxwazên lêvegerê. Rikeberiya nihînî navbera xizmetan dikare rê li ber hevkariyê bigire. Li pey lêvegerandinê, êdî îmkana garantîkirina kualîteya xizmetan tuneye. | Destûrkarên hevpar ji bo lêvegerandin û *Birêvebirina babetî* (ji wan qanûnên parastina Qada Kesnae (Herêma Xusûsî), formên lêvegera yekîne, belgewarkirin) dikarin wek rênîşanderekê bên bikaranîn. Herîkêm hînkirina kedkar û şebekeyan bi *nuxteyên navendî* ji bo lêvegerandinê dibe sebeba piştevaniya ji pêvajoyan. *Nexwşeriya 4 W* bi birojkirina birêkûpêk a agahî û zanyariyan pêwîst e. Şopandina lêvegeran ji riya têkilliya digel rêxistina wergir dibe sebeba misogerkirina kualîte, xurtkirina şebekeyê û kêmkirina rikeberiyan. |

| Hejmar | Xal | Nasandin | Kêşe | Baştirîn rêkar |
|---|---|---|---|---|
| 13 | **Pêkhateyên piştgirîkirinê / Rihetiya kedkaran** | Bi berçavgirtina vê xalê **pêkhateyên piştgirîkirinê ji bo kedkarên** MHPSSê ji heman destpêkê va hene û beşeka cudanebûyî ji proje/xebata rojane ne. Pêşeyîbûn û profesiyonalbûn bi guhêrbariya berdewam û hevrê digel xebatê zêde dibe. Pêşî li pêvajoyên westiyana şolî û ziyana rûhî-derûnî ya asta duyem ji riya **kiryarên derûnnasiya rêxistinîtê** girtinê. Di rewşa îdeal da, hin kiryar ji bo parastina saxlemiya derûnî-civakî ya kedkaran di dirêjdemê da hene. Mijarin weke çavdêrî, çavdêriya koma hevseng, xurtkirina miqatebûna ji xwe, her wiha guhêrbariyên rêxistinî weke dabînkirina malî û ewlehiya şolê, bêhnvedan û rêvebiriya ewlehiya yekparçe ne.<br><br>Heke ev xal neyê berçavgirtin, tu pêkhateyeka piştigiriyê tuneye. Diyar nine ku gelo saxlemiya derûnê û parastina pêşeyîbûnê ya kedkarên cihêner ên MHPSSê tê berçavgirtin. Li meaş û mûçeyê tu amûrek ji bo kêmkirina kêşe û pirsgirêkên kedkaran nehatiye pêşbînîkirin. | Di asta rêxistinê û di cîgeha raberker da, rihetiya kedkaran hîn jî mijareka sereke an pêwîstiyek nine. Heke berpirsiyariya parastina saxlemiya derûnî tenê li ser ustiyê kedkarên rêxistinekê be, ev yek dikare dibe sebeba kêşeya zêde û jidestdana kontrolê. | Li hundirê rêxistinê divê em rewşê ji bo fîdbeka derbarê kêşeya xwe çêbikin. Pêkhateyên piştgiriyê divê ji riya rêxistinê va pêk bên û ji aliyê rêvebiriyê va bên şopandinê. Berdestbûna kiryarên piştgiriyê derbarê *Rihetiya Kedkaran* (wek mînak deb û rismeka rêxistinî ya bi rêzdarî an nirxa ku pêwendiyan di asta rasterast da pêk tîne, xizmetên aşkira û ron yên li ber dest ji bo hemî kedkaran weke rawêjkariya derûnî-civakî (civînên kesane û komî) û raberkirina xizmetên aramker (polên werzişê û yên aramker), karê ku miqatebûna ji xwe pêkan dike, *rewşa xebatê ya ewleh û miqatebûna li xwe* (kedkar wê wek aramker berçav digirin) divê wek berpiriyariya rêxistinî li plandarêştina têgeha kiryarekê pêk were û ji hêla malî va were plandarêştin. Raberker divê plandarêştin û cihanîna kiryarên rihetiya kedkaran daxwaz bikin. |
